

# Nûbihar

Mehnameya Çandî, Hunerî, Edebi

**JI BO AZADIYÊ  
PÎR Û JIN Û XORT  
HEMÛ BI HEV RE**



# ALFABEYÊN LATÎNÎ Û EREBÎ YÊN KURDÎ

LATÎNÎ	MÎNAK	TIRKÎ	EREBÎ	MÎNAK
A a	Ard	Un	ئا	ئارد
B b	Baş	İyi	ب	باش
C c	Ceger	Ciger	ج	جەگر
Ç ç	Çav	Göz	چ	چاچ
D d	Dil	Gönül	د	دل
E e	Ewr	Bulut	ه، ئه	ئور
Ê ê	Êş	Açı, sızı	ئې، يې	ئىش
F f	Fêkî	Meyve	ف	فېنکى
G g	Gund	Köy	گ	گوند
H h	Hingiv	Bal	هـ	هنگى
I i	Ixlamûr	Ihlamur	ئـ، ـ	ئخلامور
Î î	În	Cuma	ئـ، يـ	ئين
J j	Jin	Kadın	ژـ	ژن
K k	Kulîlk	Çiçek	كـ	كوليلك
L l	Lale	Lale	لـ	لاله
M m	Mam	Amca	مـ	مام
N n	Nan	Ekmek	نـ	نان
O o	Oflaz	Sevimli	ئۇ، وـ	ئۇفلاز
P p	Paçık	Çaput	پـ	پاچك
Q q	Qesr	Saray	قـ	قىمسىر
R r	Rojhilat	Doğu	رـ	رۈزھلات
S s	Serok	Başkan	سـ	سەرزىك
Ş ş	Şil	Islak	شـ	شل
T t	Tenik	İnce	تـ	تەنك
U u	Unîversité	Üniversite	ئوـ، وـ	ئۇنيفرسیته
Û û	Ûlema	Ülema	ئووـ، ووـ	ئۇولىما
V v	Vexwarin	İçmek	فـ	فەخوارىن
W w	Wezîr	Bakan, vezir	وـ	ۋەزىر
X x	Xelat	Armağan	خـ	خەلات
Y y	Yezdan	Tanrı	يـ	يەزدان
Z z	Zava	Damat	زـ	زافا

# Nûbihar

Mehnameya Çandî, Hunerî, Edebî

Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. 51/3  
Fatih-İstanbul  
Tel: (0212) 533 75 88  
Faks: (0212) 524 00 38

- Xwedî  
(Sahibi)
- Mahmut Yarluğ**
- Berpirsiyarê Giştî  
(Genel Yayın Yönetmeni)  
**Sabah Kara**
- Berpirsiyarê Nivîsaran  
(Sorumlu Yazışları Müdürü)  
**Süleyman Çevik**
- Mudîrê Tîprêzî û Arşîvê  
(Dizgi ve Arşiv Müdürü)  
**Ali Karadeniz**
- Muşawirê Nivîsaran  
(Yayın Danışmanı)  
**Mustafa Goyani**

Nûbihar kovareke mehanî ye ku bi weşandina karpêkên çanda kurdî bi mana tevayî dilebrike. Raman û râyên xwedyên karpêkan, lizûmen ne raman û rayên Nûbihar in. Nivîsarênu ku bi ûmzeya Berpirsiyarê Giştî weya bi navê Nûbihar têne weşandin raman û raya me nîşan di-din. Nûbihar di serrastkirina kar-pêkên şandî de azad e.

**BEDELA ABONETIYA SALINÎ**  
(Yıllık abone bedeli):  
Li hundir (Yurt içi): 240.000 TL  
Li derive (Yurt dışı): 60 DM

**JIMAREYÊN HESABÊ**  
(Hesap numaraları):  
Li hundir (Yurt içi): Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265  
Li derive (Yurt dışı): Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100-3118770

Tîprêzî (Dizgi):  
Nûbihar


Berg (Kapak):  
Dönüş

Çapxane (Matbaa):  
Nesil Matbaacılık

Hejmar: 16 • Sal: 2 • Çileya Paşîn 1994

## Naverok

<b>NÜBIHAR: JI BO AZADIYÊ, PİR Û JIN Û XORT, HEMÛ BI HEV RE .....</b>	3
<b>MELA QASIM: NUQURÇ / 17-20 .....</b>	4
<b>SABAH KARA: NAMEYÊN BÊCEWAB / 19 .....</b>	5
<b>EBDILLAH AMED: ÇEND QISE DERHEQÊ KOVARA NÜBIHAR DE .....</b>	6
<b>SABAH KARA: PAREKENDE .....</b>	11
<b>YÜNIS EMRE / HOZAN OFLAZ: JI MIN RE TU LAZIM Î TU .....</b>	13
<b>S. MELE HIZNÎ / MIHEMED D. DAĞHAN: GULDANA KURDAN / 1 .....</b>	14
<b>ABDULFERD NÛR: ŞAGIRTÊ NÛR .....</b>	15
<b>ROJÎN ZELAL: RASTNIVÎSÎNA ZIMANÊ KURDÎ .....</b>	16
<b>SEYYİD BATTAL: MEDENIYET BI ZIMANEKİ PÊŞDEÇÜYÎ PÊK TÊT .....</b>	17
<b>DILKANI: SEYDA .....</b>	19
<b>KOYO BERZ: PÎRA HEDROY .....</b>	20
<b>Ö. FARUK ÇETINKAPLAN: DÊSÊ BÊ SIWAXÎ ....</b>	22
<b>ELÎ HEYDER NÛR: MEKTEB .....</b>	22
<b>ALÎ KARADENİZ: ROJANE .....</b>	23
<b>SEZAÎ KARAKOÇ / HOZAN OFLAZ: MONA ROZA / 4 .....</b>	25
<b>TEHSÎN İBRAHÎM DOSKİ: MELAYÊ BATEYÎ Û HELBESTEK WÎ YA NEWEŞİYAYÎ .....</b>	27
<b>ABDILQADIR MÊRDÎNÎ: MAF NE JI ALÎ İNSANAN, JI ALÎ XWEDÊ VE HATİYE DAYÎN.....</b>	28
<b>MUHAMMED EMİN: ZIMAN, AYETA XWEDÊ YE .....</b>	30
<b>MUSTAFA KARAOĞZ: İSLAM NE STÛXWARÎ YE .....</b>	31
<b>ABDULLAH DILBİRÎN: JI WE XEBAT, JI ME ARÎKARÎ .....</b>	31
<b>M. SALÎH AKGÜL: EZ NÜBIHAR BI NIGEHDARÎ TAQÎB DIKIM .....</b>	31
<b>FERHENGOK .....</b>	32




# Jİ BO AZADIYÊ PÎR Û JIN Û XORT HEMÛ BI HEV RE

NÛBIHAR

Wek ku her kes zane, kurd di welatê xwe yê çar-pênc parce de ji azadiyê pir bêbehre ne. Her ci halê kurdên parçen û Iran, Iraq û Sûriyê ne wek halê me kurdên Tirkîyê be ji, ew ji nikarin bi şikleki kamil ji azadiyê îstifade bikin. Lê em kurdên vê dewleta kambax, dev ji azadiyê berdin, em heta van nêzîkan “nîn” bûn! Van zaliman bi qedexekirina her tiştê me ji qîma xwe neanîbûn û talî hebûna me ji qedexe kiribûn. Bi qewla şîrîn a Cigerxwîn; “ew rîncberên dijmin bûn” lê dixwestin (û dixwazin) ku “em ji rîncberên wan bin”; “ew kerên karewanê dijmin bûn” lê dixwestin (û dixwazin) ku “hefsarên me girêdayî bi kurtanên wan bin” û em wek “hestiyê ber lingê segan” bin.

Lê hema vaye şikir ji Xweda re ku êdî ji vî halê kambax re me gotiye “na!” Êdî em naxwazin bibin rîncberên rîncberan, xulamên xulaman û hestiyê ber lingê segan. Êdî “heger bi zor û gazin / em heqê xwe dixwazin”; ci bi biratî, ci bi dijminî.

Lê belê heq û azadî, tenê bi “xwestinê” na-yin sitandin. Pêwîstiya gelek tiştên din ji heye. Xwendin û zanîn lazim e. Qehr û merhemet lazim e. Hem mêtî lazim e, hem dil. Hem nefret lazim e, hem evîn û muhebbet. Yekbûna ji dil û mêtî û ruh lazim e. Xwe bi heqiyê ve gitin û dev ji neheqiyê berdan lazim e. Pêşketîna zanînî, hunerî û siyasî lazim e. Fethkirina mêtî û dilan lazim e. Ü desthevrgirtin lazim e.



Bihevrebûn lazim e.

Ne mumkin e ku hemû kes wek hev bifiki-rin. Mirovîn malekê ji di her tiştî de wek hev nafikirin. Pênc tiliyên destekî ne wek hev in. Lî tilî bi hev re ne; li cem hev in û hemû bi hev re dibin dest, dibin kulm; karê xwe dikin, li ber xwe didin.

Han, kurd ji lazim e wek destekî bin. Ci pîr, ci ciwan; ci jin, ci mîr; ci nûciwan, ci xort... Lazim e her kes bi yê din tehemul bike;

her kes bi yê din yarkarî bike. Heger mirovin çewtfikir di nav me de hebin, lazim e em yarkarê wan bin û em wan ji çewtiyê xelas bikin.

Vaye em mensûbêñ Nûbihar li vir ilan dikin ku, wek em ji hemû zaliman nefret dikin, em ji hemû mezlûman ji hez dikin. Wek em xwe ji hemû zalmîn ji dîn û baweriyêñ muxtelif bi dûr dibînin, em xwe bi hemû mezlûmîn ji dîn û baweriyêñ muxtelif ji nêzîk dibînin. Xweda û hemû kesen ku me nas dikin ji şahid in ku em alîkarê mezlûman û dijminê zaliman in.

Naxwe mezlûmino, werin em bi hev re bin! Hun di ci baweriyê de bin, werin em guh bidin we û hun guh bidin me.

Xelasî bi vê dibe birano; bi mêtîyekî bihêz û bi dilekî fireh, dibe. Xelasî tenê nefretê naxweze. Bi qasî nefretê, evînê ji dixwaze.

Naxwe ka hun li benda ci ne? •

# NUQURÇ

M E L A Q A S I M

**17.**

Eger kurd wê b'kuştina zarokan xelas bibin  
Bihêlin xelas nekin, bila kurd xilas bibin  
Xelasî bi edalet û merhemetê pêk têt  
Yên ku guh nedîn vana, wê talî îflas bikin

**18.**

Tu nikarî kurdî û kurd ji hev biqetînî  
Ko xêra kurdan divî gerek kurdî bixwînî  
Mêro ji te dipirsim, ma eger kurdî nebe  
Ma tê kurd bi xwîna wan ji tirkan veqetînî

**19.**

Berya em xerbzede bin, roj ronî bûn, şev tarî  
Xerbî hatin, roja me bi nêvî kirin tarî  
Êdî donzdehê şevê roja me dest pê dike  
Û hîna dema nîvro, roja me dibe tarî

**20.**

Lato fraqê xwe yê bi dûvik jibîr kirye  
Şalwarê kurdêñ reben, xewê j'çavê wî birye  
Lawo ev ci parêz û ev ci sîr û tirşî ye  
Şal me l'vir hişt ma ka fraq te b'heyvê birye

# NAMEYÊN BÊCEWAB/19

S A B A H   K A R A

**7 Tebax 1992**

Ey afeta dillerzan  
Ey qerar  
Ku însan bêqerar e  
Mîna mewcê sahîlan ku xwe l'zinara dixin  
Û divegerin b'al bahrê ve  
Lê cardin berê xwe didin latan  
Da ku serê xwe l'wa bixin

Ey afeta dillerzan  
Ey huzn  
Ku însan mehzûn e  
Mîna govendan  
Ku mest dikin  
Û dema ku dest û pa dikişe  
Şeva huznê dest pê dike

Ey afeta dillerzan  
Ey eşq  
Ku însan aşiq e  
Heta ku bighe Leyla, Mecnûn  
Û di qata wîsalê de  
Tenêtî heta taliya xwe

# ÇEND QISE DERHEQÊ KOVARA NÛBIHAR DE

EBDILLAH AMED

Pêşıya destpêkirina nivîsa xwe, ez hemû xebatkar û berpirsiyarên kovara Nûbihar pîroz dikim ku bê rawest û bê likumandin kovara me gihadin vê demê û dîsa ez gelek minetdarê xwendevanên Nûbiharê me ku, bi hemû celeb arîkariyên xwe, piştgirtin û hevspartin dane kovara xwe. Ji Yezdanê Berz dixwazim ku ev destek û destbiratî her hebe û berdewam be.

Xwendevanên hêja! De ma İslamiyet li Kurdistanê çû ava (wenda bû), li her deverê welêt ‘zordarî’ fermandar bû. Ev zordarî geh bi destê Emewiyan, geh bi destê Ebasiyan, geh bi destê Selçuqîyan, geh bi destê Osmaniyan, geh bi destê Sazûmana Komera Tirkîyê, bi kurtî ev hezar sal zêdetir e ku zordariya beşerî li ser vê axa Pêxemberan, Xwedadostan, zanyaran, mîrxasan... tête tetbîqkirin û her wiha, tête domandin. Di vê hengava dirêj de herçiqas dem bi dem hinek fermandarên adîl û dadvan derhatibin jî, lê çi mixabin ku temenê wan kurt bûye. Wek ji Emewiyan Omer kurê Ebdilezîz, ji Ebasiyan Mehdî yê Ebâsi, ji Eyûbiyan kal Selâ-

heddîn... Jixwe Pêxemberê me di hedîseke xwe de ma nabêje ku: “Xîlafet, pey min re, wê sih sal bidome, dûv re wê fermandarî tekeve destê melîkên xwinxwar (edûd)” Belê zanyarên İslâmî dibêjin ku ev sih sal, hatanî şes mehê xîlafeta Hesen kurê Îmamî Elî domiye. Pişt re ketiye destê sultanên Emewiyan ên nijadperist û herwiha bi destguhertin meşiyaye.

Piştî fermandariya sultanên despot, hemû gelên misliman di bin dest û lingên wan de pelçiqline, stûxwar bûne. Ne-xasim gelê kurd ji destê van despotên xwînxwar gelek tade û telefat dîtine. Eger em nimûnekê bidin; şerê sedsalan ên di navbera împeratoriya Osmanî û şehînsahiya Iranê de çêbûne, bê îstisna di gişan de gelê kurd hatine şixulandin. Iraniyan gotine, “Osmanî dijminê Alî Beyt in û ev sunniyana qatilên Îmam Elî û kurên wî ne” û gelê kurd şandine ser Osmaniyan. Osmaniyan jî gotine, “ev Iranî şîne, dijminê Ehli Sunnet wel cemaet in, neyarê sehaba ne, bawerxelet û rîçewt in” û gelê Kurdistanê şandine ser Iraniyan. Bi vê dezgeha şeytanî û konetî, kurd bi kurdan

dane kuştin, bi mîlyonan xwîna wan wek ava çeman bi destê hev dane rijandin. Halvakî, ne şehînsahî Iranî, Alî Beyt bûn; ne jî Sultanên Turanî ji Ehli Sunnet wel cemaet bûn. Ya rast ev e ku her du hîl jî, ehlê cariye û seray bûn. Dîn, di destê wan de, ji bo ge-hîştina armancêwan ên genî û menfûr, hewtenê wek leyistokek zarokan bû. Digel gelên nezan û korfam jî, bi van meramên wan ên genî û qirêj nizanibûn; ji ber vêya, ew jî tim û tim ji wan re xulam bûn, qurban bûn.

Binêrin, bi tenê di şerrê Çaldiran de 500.000 misliman ji her du hêlan hatine kuştin. De hun bibêjin û biryar bidin, gelo ma ci pêwen-diya vî şerrî bi İslamiyetê re heye? Hetta, qasî em pê dizanîn, şexulislamê Osmanî ji bo vî şerrî destûr nedaye Yavuz Selîm, lêhemâ Yavuz ev hukmê şerîta Yezdan berdaye, li ser orfîn Tûranî meşiyaye û dûvre jî şexulislamê xwe kuştîye. Niha mirov ji van kiryan re “İslamiyet” bibêje, ma heqaret û piçûk-xistina herî mezin nîn e. Vaye, di vê nuqtê de Turanîperist û çepokan, xeletên gellek mezin dîkin. Lewra herdu

wan jî, ji vê icraetê re "îslamîyet" dibêjin. Lêbelê, zemîn li kû, ezman li kû? İcraeta Pêxember li kû, icraeta şah û sultanan li kû? Ma edalet û zordarî, ti car dabin wek hev?

Ya rast, ez naxwazim behsa şah û sultanan bikim. Lewra behskirina wan, weke mirov têkeve nav celboxekî, çiqas tê de bilive, ewqas tê de diçê xarê. Encax ez ê vêya jî bibêjim ku, ev siyaseta şah û sultanan, ketiye xûy û jiyana mîr, axa, beg û şêxên me kurdan de jî. Jixwe gotinek heye (dibe ku hedîs be) dibêje: "Mirov li ser dînê melîkên xwe dimeşin" Ma ne wişa ye? Binêrin li rewşa Kurdistanê. Ji bilî hînek îstîsnayan, hemû şêx, mîr, axa, beg, eşîret, partî û hwd, gişt bi xûy û exlaqên fermandarên zordest û xwînx-war xûgirt û exlaqdar bûne. Her yek jî bo xwe dişuxule, ji bîrûbaweriya xwe re xîzmet dike, ji dervê xwe ti tehemula hebûna kesî nakin. Dorhêl û civatên xwe, bi taybetî vî gelê mezlûm ji xwe re feda dikin û li ser pişta wan, hebûna xwe didomînin.

Belê, ev exlaqê siyaseta zâlim, pijiqiye her tişti û her sınıf mirovan. Meselen, hemû dinya pê dizane ku gelê kurd 90 % (nod ji sedî) misliman e. Ü mislimantiya vî xelqî wek tavê xuya û eşkere ye. Lê em dinêrin ku yên li ser navê kurdan derdi Kevin holê, rêk û dirbêñ didine ber me kurdan, bi tevayî biyanî ne. Yek dibêjê sosyalîzm an qomunîzm, yek dibêje demokrasî, yek dibêje sirf (hew) neteweyetî, yek dibêje senteza tirk û îslamî,

yen dibêje di meclîsa Cumhûriyeta Tirkîyê de cihgirtin û hwd. Niha hun jî dizanin ku ev hizirêñ biyanî ewqas zeman e ku ji kul û kovanê me kurdan re nebûne derman. Ber eks, birînê me xedartir û kovanê me dijwartir kirine. Çareserî ev e ku; madem em (kurd) misliman in û madem mislimantî dînê Yezdan e û madem Yezdan afirandoxê hemûyê gerdûnê û mirovan e, naxwe pêwîst (wacib) e ku em jî li azadiyê, rizgariyê û serxwebûnê di dînê Wî de bîgerin. Lewra wek saydayê



Le Figaro

mezin Seîd Norsî dibêje: "Madem sazbend (pişesaz) di zane, naxwe bila ew bipeyi ve" Yanê derheqê berhem û pîşe (sen'et)kî de biryara ve bir, ya hoste û sen'etkarê wê ye.


Encax ez vêya dîsa bibêjim ku, dînê ku em dibêjin û dixwazin, wek Yezdan di Qur'ana pîroz de salixandiye û wek Pêxemberê me bi devê xwe şîrove û bi tevgerî û livbaziyêñ xwe daye nişan e. Yan jî ne ku dînê şah û sultan û mîr û şêxan e. Li ser ci na vî dibe bila bibe, dînê ku ji

sazûmanêñ diktator (wek Cumhûriyata Tirkîyê) û ji fedodalan re bendewer be, em bi wî dînî ne bawer in. Ber eks, dînekî (ol) wiha dûvik, tehlîkeyek pir mezin e.

Vaye, ji vê pêşekiya dirêj şûn ve (li min bîborin) ez ê derheqê kovara Nûbihar de hînek tiştan bibêjim.

Kovara Nûbihar, di nav rewşa nexwestî ya Kurdistanê de, wek tavekê hilhat (za) û ji me re bû hêviyek gelek mezin. Bi zimanê me (kurmancî, dimîlî), ji me re bi dersdariya azadiyê, rêka serxwebûnê da ber me. Bi kurtî, çareseriya pirsgirêka me kurdan raberê kerd. Di ger sed mixabin ku, ev reçeta çareseriye bi destêñ hemû kurdêñ Kurdistanâ Bakur na keve. Lewra Kurdistan iro bûye serjêkxane (mezbeha); her roj bi dehan bi bîstan... mirov tê de têñ kuştin. Bi ewqasî jin û jinbî, bi koman zarok û sêwî, kal û pîran ji çavan xwîn di herikînin. Ü bi mîyonan kurd jî di şînê de ne. Çareseriya vê rewşa xedar jî, gelek dûr û ne xuya ye. Bêçareti roj bi roj zêdetir û dijwartir dibe. Her deverê Kurdistanê bi gur, keftar, çeqel û reqelan tije bûne. Ji ber vê awayê, Nûbihar rêk nabîne ku bigihîje destê van bêçareyan. Ez bawerim ku ev doza ku Nûbihar dimeşîne, ger bi cih bê, yan bête nas kirin, wê hêstirêñ çavêñ gelê me zoha bike û wê ji kul û keserîn wan re bibe derman.

Heta salek û çend meh berê me çavê xwe digerand, li piyasa weşanan ti kovarek, rojnameyek, pirtûkek bi zi-



manê kurdî û li gor îslamê nedidît. Ji ber vêya, em gelek dilxwîn û xemgîn dibûn. Weşanên kurdî yê çapkirî hemû bi zimanê gelê me hizirên çepeltî, îdeolojiyêna bela serê gelan li gelê me aşê dikirin. Ev jî felaketek mezin e; lewra bi hezaran xort û keçen me, ji ber van weşanan bawerî û exlaqên xwe yêna îslamî winda kirine. Ji ber vêya jî di nav gelê kurd û xortênd kurd cudahî û hevqetandin çêbûye. Xelqê me bi ti awayî vê nebaweriya xortan nepejîrinin, lê bêçare ne, bêxwedî ne, bê rêber in. Wek min li jor jî gotibû, iro li Kurdistanê emniyet (ewlewî) nemaye, bawerbûn û hevsiparî gelek xera bûye; hemen herkes ji bo jînparêziya xwe dixebeite. Pir kes jî ditirsin ku, biçin ji rojnamefirosan kovarekê yan rojnameyekê bikirin. Lewra ji hêla sîxûr û ropêlên Komara Tirkîyê ve bi piranî têna taqîpkirin. Ev şert û mercana ji bo Nûbiharê zêdetir nebaş in. Lewra çepok di dijê Nûbiharê de dişuxulin, zilamên Komara Tirkîyê dijberê Nû-

biharê ne; ci mixabin e û gelek sosret (ecîb) e ku hinek ciyat û komelisên misliman jî vê dijberiyê li hember Nûbiharê dikin ku, ev rewşeka gelek kirêt û astengeyek herî mezin e.

Meselen, li Amedê qasê ku ez dizanim, ev dijberî û astenge pir dijwar in. Ji bili çend pirtûkxanêni misliman û çepokan gelek ên mislimanan û goya welatperweran, Nûbiharê nafiroşin. Xusûsen hinek komikêni misliman dibejin "Hun rehperist in û ji PKK'yê re xîzmetê dikin." Ji dervê viya, qasê ku ez dizanim, Erxenî ıstîsna, hemû qezayêni Amedê, Sirûc, Serek, Serêkaniyê ıstîsna, hemû qezayêni Rihayê; ji bili Batmanê hemû qezayêni wê; Qızıltepe ıstîsna hemû qezayêni Mêrdînê; Bingol navend xarîc, bi hemû qezayêni xwe; Patnos ıstîsna, hemû qezayêni Agirî; Şırnex bi hemû qezayêni xwe; Erzirom û Meletî ıstîsna, hemû qezayêni Wanê ji kovara Nûbihar bêpar û mehrûm in. Ediyaman bi xwe jî wek vana ye.

Sedemên vî tiştî, pêşînen ez karim bibêjim ku di Kurdistanê de bê emniyet û tirs hakim e. Pir kes newêre ku Nûbiharê bixwîne û salix bide, ev yek.

Ya diduyan, ji serî ve organizasyonek baş a belavkirinê nehat çêkirin û ev dem jî hêj çênebûye. Tabî sedemê viya jî, ji ber ku gelekên kovarên mislimanan hinek ji tirsê hinek jî ji nepejirandina Nûbiharê ji danaskirinê (reklam) reviyan. (Çi heyf û mixabin ku çend heb kovar û rojnameyê çepêni kurd bi dilxwazî û sîtayîş danaskirin çêkirin. Bila pozê mislimanen me bişewite; disa xwe reşkiyin ku ci derece semîmî ne dan xuyakirin.)

Ya sisêyan ev e ku, gelek ji kurdên me xwendin û nivîsandina kurdî nizanîn, ji ber wê leqeyp dimînin.

Ya çaran, hêj qedroya nivískarêni Nûbiharê hindik û qels in. Meselen yên wek Mîhemmed Metîner û Osman Tunc herçiqas kurd in, di edebiyata tirkî de jîr jêhatîne, lê şerm e ku heta niha ni-

vîsek wan ya dirust di kovarê de bi zimanê zikmakî derne-hatiye. Em hêvî li nivîsarêd wan in.

Ya pêncan, gelekên kurdan bi Kemalîzmê ve entegre bûne. Hemû hêzir û tevgerên wan cahşikane ye. Ji ber viya, tehemula kovarên kurdî na-kin.

Ya şesan, qorek ji kurdan di nav civatêن îslamî yên sentezkar de ji binyad û rîçika xwe dûr ketine, kok û nejada xwe jîbir kirine; heta hinekên wan qedexe û înkariya xwe dikin.

Ya heftan, hinek kurdêñ me jî ji ber ku netewe û neteweperiştiyê, an mafxwazî û nejadperiştiyê ji hev cuda û mifreq nagirêñ, ber eks têk-hev dikin, bi nezanî û korî êrîş didin ser dozêñ mafxwaz û dadperweran. Ev kesanan di peyvan de şerîetxwaz xuya ne, lêhema tevgerî û kiryarêñ xwe ji şerîeta Yazdan re dijberiyê dikin û gelek mirovan ji jî şerîetê dûr dixînin. Lewra pir kes dibêjin: "Madem şerîet ji pirsgirêka kurdan re wisa biyanî ye, wê çaxê ev şerîet ji me re ne lazim e."

Van astengêñ ku min behsa wan vekir, divêt ji holê rabîn. Encax bi zorê nabe, bi rîndiyê, bi tebat û aram, bi xebatek bingehî wê hêdi hêdi batum (edim) bibin. Heyanê batumbûn û hilandina van astengan, çawa dibe bila bibe, di nav ci mercan (şertan) dibe bila bibe, miheqeq divêt kovara me bête jiyandin û weşandin. Nûbihar çawa weke barana nîsanê, gelek kulîlkân (xortêñ) Kurdistanê ava û vejîndar kir, herwiha, şayed Nûbihar ji holê rabe, yanê weşandina wê -Xwedê meke-bisekine, wê ew kuhlîkana bi-

permilin û bê hêvî bimînin. Ez hêvîdar im ku xebatkarêñ Nûbihar ên mîrxas û lehen-ger wê fîrsend û keysê nedin wendabûna Nûbiharê.

Bi derkeftina Nûbiharê, herqasê ku me hêvî dikir ne-be jî, gelek mezîn çekir. Pir mela, feqî, esnaf, karker, xwendevan, mamoste û ni-vîskarêñ kurd ên misliman û dilşewitî û welatperwer li hêviya kovareke wirganî bûn. Dibêjin: "Kovarêñ din ên kurdî herçiqas behsa pirsgirêka kurdan dikin, lêhema dûmahî de hertiştî tînin bi sosyalîzmê ve girêdidin û çareseriyyê di sosyalîzmê de dibînin; ji ber viya em jî ji van berhem û weşanêñ kurdî aciz bûne... Spas û sitayîş ji Yezdan re ku, em gihadin Nûbiharê."

Belê, em jî van peyvîn xwendevanan rast dibînin û tesdiq dikin. Lewra, çawa zîlam an civatêñ ku îslamiyete dişuxulînin, lê ji bo pêvgirêdana tirkîtiyê, kurdan dixapînin, ziyan û zirareke mezîn e, herweha yên kurdîtiyê dişuxulînin û ji bo pêvgirêdana sosyalîzmê kurdan dixapînin jî zirar û xesareke mezîn e. Em mislimanêñ kurd, bi Nûbihara xwe dozdariya Kurdistanêke îslamî dibînin. Di pêş çavêñ me de kurdêñ bê binyad û kurdêñ bê dîn (ol) wekhev in. Lewra di baweriya me de dîn û millet wek goşt û hestî ne. İnsan jî bê dîn nabin. Weke feylosefekî Yewnanî dibêje: "Ez gelek war û welat geriyam, min pir cih bê kargeh û xwendegêh dît, lê ti cihekî bê mabed nedît."

Jixwe gundekî xuya, rêber naxwaze; milletêñ ku bê dîn û bawarî mane, tev hatine ber qerax û êşîga qiyametê.

Vaye, Nûbiharê bi me xelqê Kurdistanê da xuyakirin û pe-yitandin ku, xwendevan û te-refdarêñ Nûbiharê, hem dinya hem jî axîreta kurdan re, herî pêş ve ye hemû gelên bindesten cihanê dixwaze; û jibo van herdu aleman bi lez û bez dixebeitin. Kesên xêrxwazêñ kurdan in, bila van herdu cebheyêñ kurdan bi-din ber çavan. Na heger dijwanî bilivin, bila zanibin ku ew kujtarêñ (qatîl) kurdan in; ferqîtiya wan û M. Kemal tineye û wê bi wî re bêñ he-sîrkirin; lewra doza wî dimeşînin.

Nuqtek din, Nûbihar bû xwendegêh (mekteb) ji me re. Ji ber ku kovarek îslamî ye, gelek xortêñ kurd ên misliman ku em nas dikin, bêtirs û bi ewlewî Nûbiharê dixin destêñ xwe û ger xwendinê zanibin hemen weke tîh û bir-çiyan dixwînin, na heger ni-zanibin bixwînin, heman ji bo xwendina wê dixebeitin û di demek kurt de hînê xwendin û nivîsandinê dibin.

Nûbihar, bi naveroka xwe xwendevanan hişyar dike û her bike. Pir kesên ku, mirov nedîwêrî li bal wan behsa mafê kurd û Kurdistanê biki-ra, bi derkeftin û xwendina Nûbiharê iro ew kesanan di vê mijarê de herî jêhatî û kîrbaz bûne. Ev jî ji bo gelê me pêşveçûnek mezîn e.

Nûbihar di qada misliman de, pirsgirêka kurdan da-ye pejirandin. Ji ber ku mislimanê me li hember çepo-kan pêşînhizir in, welew rast be jî, fîkrêñ wan napejirînin û weşanêñ wan naxwînin. Lêhema Nûbiharê ev pirsgirêka di çerçova Qur'an û hedîsan de bi misliman da zanîn û pejirandin. Her rû-

pelên Nûbihar, raber dike ku encax û encax doza kurdan û welatê wan bi dozeke rast û heq wê biserkeve, çareser bi-be. Yan jî zeman, zemîn û şertan bi me dan xuyakirin ku ev doza meşrû, bi rêk û dezge û kiryarên çewt û çepeltî naçit serî. Ber eks, bi van rêk û metodan doza kurdan paş de dimîne û kurd henî şerpeze dikevin. Divêt em bi destê xwe rêk û dirban li pêş xwe negirin û dawa xwe ya meşrû nefetisînîn.

Îro mirovekî bêterefane were li Kurdistana Bakur bigere, li rewşa wê binêre, wê bibîne ku îro kurd di nav ci tofanek mezîn de ne. Meselen, li gundekî bîst mirov bi carkê ve bêñ kuştin, hemû kes û çapemenî wê bibêjin "Qetliam/tevkujî". Encax ev rastiya li ber çavan e ku, heman her rojêñ Xwedê cil, yekcarna pêncî mirovîn me têñ kuştin. Lî ji ber ku cuda cuda têñ kuştin, kes nabêje ev "tevkujî" ye. Û evêñ têñ kuştin, heman heman hemû kurd in.

Vaye, Nûbiharê bi me da zanîn û xuya kir ku, ev çerx (esr) çerxa kuştinê nîn e. Netewêñ mezlûm ên stûxwar û binketî, divêt bi xwendin, desthevgirtin, piştgirî, hevs-partin, destgirî, destbiratî, arikarî, yekitî, cihannasî, diplomasî, çandvejandin, dîrokzanîn, welatperwerî, aborbingehî, civatçêkirin û bi hw vana bigehijin armanca xwe. Heger rêk ji kuştinê re hebe jî divêt serok û pêşengên zordest û mîtingeran bêñ kuştin ku, da cohnîkêd (çok) wan bitewe, nîzê aşitî û mafdayînê bibin. Yan jî, weke

dibêjin "Bi mîlyonan leşkerêñ me hene; bila ji wan sedhezar bêñ kuştin, lê me dîsa mafê kurdan neda. Em ê qira kurdan bînin, lê me nehişt ku meremê wan bi cih bê..." Naxwe têt fêmkirin ku ev neviyên Cengiz û Hulagû dev ji tewetê xwe yên qedîm bernadin, encax em dizanin ku xwîna kurdan jî ne erzan e. Naxwe, rêkek mirov nebe çareseriye, divêt mirov dev ji wê rêkê berde û biguhêrîne. Belê, ev tiştana, ev rastana hemû me bi sayeta Nûbiharê xistiye serê xwe.

Di dîroka Kurdistanê de gelek şervan û têkoşer, zana û nivîskarêñ kurd derketine holê. Em li jiyannameya evan dinêrin, hemen hemuskî

**Nûbiharê** bi me da zanîn ku, netewêñ mezlûm, divêt bi xwendin, desthevgirtin, arikarî, yekitî, cihannasî, diplomasî, çandvejandin, dîrokzanîn, welatperwerî, aborbingehî, civatçêkirin û bi hw bigehijin armanca xwe.

bi nasname û kesantiya xwe misliman in û hemû têkoşîna wan jî, ci bi pêñûs ci bi pisat dike, ji bo Yezdan û di rêka Wî de meşandine. Wek Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Şex Ehmedê Xanî, Eliyê Herîrî, Şex Ubeydullahê Nehrî, Mela Mistefayê Barzanî, Şex Seîdê Pîran û Seîdê Norsî ye Hîzan, Seyid Rizayê Dêrsimî, Xalidê Cibrânî, Doxtor Fuad, İhsan Paşa û wek mînakê vanan gellek bavê lawan... lê em dinêrin, ci mi-xabin ku, ji ber ku mislimanan nasnameya vana yên rastî dernexistin holê, çepokan jî ji vê bêkêriya mislimanan iştîfade kirin û bi gor bîrûbaweriya xwe ev mezinêñ me gelek çewt û çepelane bi me dan nasandin. Bi her awayî

qilopilo (serûbin) kirin, ji hezar best û newalan avêñ genî anîn, her dever û her tişt şîlo û berbad kirin. Kesantiya wan şer û pilingêñ ku roj li me ronî kirine, di şevêñ reş de hiştin. Gotin vana têkoşer bûn, pêşverû bûn, şoreşvan bûn, welatperwer û parêz bûn, zana bûn, şervan bûn, bi kurtî her tişt bûn, lêhema ne misliman bûn. Haşa... ev derewa nakurise miyandê erd û ezman. Hem dibêjin, ti têkilî û pêwendiya wan bi dîn re tine bû, hemû xebatêñ wan netewî bû, ji bo gel û welat bû.

Vaye, kovara Nûbihar ev perda reş û genî ji ser van şexsiyeten hêja û lehenger hilda, rûçikê wan yên heqîqî da xuyakirin. Me dît ku belê ew herçiqas zana, şervan, şoreşvan û welatparêz bûn, lêhema bingeha hemû tevger û bizavêd wan jî

Qur'ana Yezdan û sunneta Pêxemberê Ekrem bû. Hemû hêz û çalakiyên xwe ji dîn û baweriya Yezdan digirtin. Bi vî awayî, bi sayeta Nûbiharê me pêşeng û lehengên xwe naskir û em didin naskirin. Ev rastnivîs û dirustbêjiya Nûbiharê, durûf û derewçîniya çepok û Kemalistên hemba-wer derxiste meydânê. Yanê potê wan ên qirêj û genî eş-kere bû. Hêviya me ji Yezdan e ku, wê Nûbihar van şexsiyeten qedirbilind ji nav van lep û devêñ genî gewrende derbixîne û têxe mal û yaranêñ me kurdêñ misliman.

Tu herbijî Nûbihar  
Salvegeriya Nûbiharê li hemû gelê Kurdistanê pîroz be. •

# PAREKENDE

## SABAH KARA

### Mirovê ûro çi cûr mirov e?

Te ji min pirs kir: "Mirovê ûro çi cûr mirov e?"

Min got: Bêkok+bêemni-yet+bêhêvi...

Te got: "Ma çare?..."

Min got: Bikokî+biemni-yeti+bihêvitî...

...

### Refaha İslâmî û refaha xerbî

Te ji min pirs kir: "Refaha İslâmî çi ye; refaha xerbî çi ye?"

Min got: Refaha İslâmî, belavkirina refahê ye, di nav hemû kesan de; û refaha xerbî, belavkirina refahê ye, di nav hin kesan de.

Ko ez vê bi ifada İslâmê bibêjim:

Di İslâmê de, nîmet bi ser civatê de dibare; lê di kufrê de, bi ser eqeliyetê de...

Te got: "Ma delîl?..."

Min got: Tarixa birûmet a mislimanan.

...

### Kemalist û azadiya jinan

Kemalist dibêjin: "Me jin azad kiran."

Lêbelê ma jinêne neazad çawa guleyên topê bi cebhê

neqil kirin? Ma Nene Xatûn çawa da ber mîran û wan bi serhildanê bihay kir?

Naxwe kemalist ne jinan, lê rûj û oje û pûdre azad kîrin.

...

### Xweda kesê bêkesan e

Te got: "Mirov çiqas feqîr û belengaz dîbin, ewqas xwe bi dîndariyê tesellî dikin."

Min got: Şikir ji Xweda re!



Naxwe tu jî qebûl dikî ku, Xweda kesê bêkesan e.

...

### Dîwarê vê dewletê

Piştä xwe nede dîwarê vê dewletê; ko bi ser te de nekeve, wê marê di bin de, bi te vede.

...

### Ev dewlet dişibihe ci?

Te got: "Ev dewlet dişibihe ci?"

Min got: Dişibihe kabadayî' yekî gerdenqalind; lêbelê bi îstîsnayekê... Dema ku gerdenqalind ji ber te ve diçe, tizbiha xwe dihejîne; lê dema ku dewlet ji ber te ve diçe, copê xwe dihejîne.

...

### Mizgeft û minare û dua

Tu dibêjî: "Ez bê mizgeft û bê minare û bê dua me."

Na! Tu him bi mizgeft û him bi minare û him bi dua yî. Lê mizgeftên te, bar û dîskotek; minarên te, antenêna radyo û televizyonê; û duayêne te, rok û tango ne.

...

### Ciwanê modern

Dîn ji destê ciwanan girtin; lêbelê ti tişti nedane wan. Loma ûro gellek ciwan, ne xwe ne û ne tiştî in. Şiklekî bê şikil, rengekî bê reng, mirovekî bê mirrovahî, û bedeneke bê rih in.

...

### Panorama vê rejîmê

Were li vê rejîmê binhêre:

Ji bazarganan, ê herî diz kîbe, ew serokê oda bazarganiyê ye. Ji çandmendantan, ê herî vala û kêmkultur kî be, ew serokê teşkîlata çandî ye. Dema ku serraf iflas dike, di be bankêr. Siyasat ji bêşerrefan re bûye meydana lîstikê. Serokê ji ber ku cahil e napeyive, bi navê **weqûr** tête naskirin; yanê navê nezaniyê, bûye **weqar**. Ê ku derewan dike, dibe reyiscumhûr. Xulase, navê bênamûsiyê bûye **namûs** û navê namûsê bûye **bênamûsi**.

Çawa ku tiştên sivik li ser avê disekinin; di girikiya vê rejimê de jî, yên sivik, li jor; lê yên giran, li jêr in.

\*\*\*

### **Sertêñ ronakbîriyê**

Nivîskarê İranî Celal Al-î Ehmed dibêje ku, sê sertêñ ronakbîriyê hene:

1- **Firset**, yanê wextê vala.

2- **İcazet**, yanê imkan û izn û qeweta fikri.

3- **Cesaret**, yanê dilxwazî û dildarî; amadebûna derûnî û daxilî û netirsîn.

Wextê ku meriv xwedyê van xusûsiyetan be, kare bibe **ronakbîr**.

\*\*\*

### **Devjidînberdana xerbê û devjidînberdana me**

Ma ne tiştekî calib e ku xerb dev ji dîn berda û pêş de ket, lê me dev ji dîn berda û em paş de ketin.

\*\*\*

### **Netitişt**

Gelo ev rojname û kovar û qenalêñ televizyonî yên vê


dewleta **netitişt**, ma herkesi weke xwe **hov** dihesibînin ku dixwazin **mitriban** weke **muzîknasan** û **qafiyebazan** weke **şairan** û **hîlekaran** weke **psîkologan** û **erzihalciyan** weke **nivîskaran** bidin naskirin?

\*\*\*

### **Maddeyêñ tebî û maddeyêñ insanî**

Weke ku herkes zane; dagirker û talankerên xerbî, ji welatê me mezlûman, bi şikleke esasî, du tiştan didizin: **mêjî** (weke koça zanayêne me bi terefê xerbê) û **xavmadde**.

Erê ev, heqîqeten adeta



zaliman e ku **maddeyêñ tebî**, di **heddê nihayıya xavîtiya wan de** û **maddeyêñ insanî**, di **heddê nihayıya çeyî û mukemmeltiya wan de** digrin û dibin.

\*\*\*

### **Tewhîd û yekanetiya Xweda, yekanetiya tebî-**

**etê, yekanetiya îdeal, yekanetiya nijadêñ beşerî û yekanetiya hemû insanan**

Bi qebûlkirina Xwedayekî **yekane** û mücerred bi unwanê merkeziyeta itîqadê, em pêş bi **yekanetiya** Xweda şehadetê dikin; û dûvre jî bi vê rîyê, bi **yekanetiya** tebîtê û **yekanetiya** îdealan û **yekanetiya** nijadêñ beşerî û **yekanetiya** hemû insanan, em dil girêdidin.

\*\*\*

### **Kemalist**

Kemalist, dışibînin darêñ pir ecayib ku kokê wan li Ewrûpa, yan li Emerîqa û fêkiyên bi jehr ên wan li vir in.

\*\*\*

### **Siyaset û qewet û mexlûbiyet**

Adeta xelkê ev e ku, qewî û zordaran esl û esas hesab dike. Loma, di siyasetê de gereke meriv hîç mexlûb nekeve. Lewra dema ku tu mexlûb ketî, gellek ji wan kesen ku şeqşeqçîtiya te dikirin, wê sûcê her tiştî bavêjin qîrika te; heta bi wî heddi ku, çîma baran bariyaye yan berf û hwd.

\*\*\*

### **Zordarî yan evîn û merhemet**

Di vî memleketi de mirovîn gêj û nezan ewqas pir in ku meriv mecbûr dimîne bibêje:

**Di vî diyarî de heger tu dixwazî tiştekî bidî qebûlkirin, gereke dar di destê te de be.** Lêbelê cardin jî ez dibêjim: **Na; evîn û merhemet, payedartir in.**

Hun ci dibêjin? Gelo ez xwe dixapînim, an na? •

# JI MIN RE TU LAZIM Î TU

YÛNIS EMRE  
Ji tirkî: HOZAN OFLAZ

Ev eşqa Te min ji min girt  
Ji min re Tu lazim î Tu  
Ez roj û şev dişewitim  
Ji min re Tu lazim î Tu

Hebûn kêfa min nayîne  
Nebûn huzna min nayîne  
Min eşqa te dihebîne  
Ji min re Tu lazim î Tu

Eşqa Te aşiq dikuje  
Bi behra eşqê davêje  
Bi tecelli tişe dike  
Ji min re Tu lazim î Tu

Ez ê j'meya eşqa t'vexwim  
Bibim mecnûn û bimeşim  
Ez bi fikra te serxweş im  
Ji min re Tu lazim î Tu

Ji sofî re sohbet lazim  
Ji exî re axret lazim  
Ji Mecnûn re Leylî lazim  
Ji min re Tu lazim î Tu

Ko min pare pare bikin  
Xweliya min bêjing bikin  
Wê axa min jî feryad ke  
Ji min re Tu lazim î Tu

Yûnis Emre ye navê min  
Tim dişewite dilê min  
Du cihan de meqsûdê min  
Ji min re Tu lazim î Tu

# GULDANA KURDAN/1

SEYDAYÊ MELE HIZNÎ  
Ji tîpêñ erebî: MIHEMED D. DAĞHAN

(Rojekê seydayê min ï hêja û delal di qunika mizgeftê de, ji min re got: "Binvîse bi navê Yezdanê dilovan." Wî got û min nivîsi. Ew ji gotinê, ez ji nivîsandinê westiyam. Lê ne gotin û ne jî nivîsandin qediya. Han ji we re pêşkêş dikim van cewherên ku bîst sal in wendayî bûn.)

M. D. Dağhan

## WERZÊ EHLÊ XWEDA

Baharekê, li ser qada welatê Gêxiyê de baran kêm dibare. Wisa ku, reng û rûyê gîhan dixeyirin, pelên wan dipirmitin, bejna wan zirav dibin û ber de difirin.

Yek ji ehlê Xwedê diçe nav mîrg û çîmenan. Dema reng û halên zîlan dibîne, destê lavakirinê hêla ezman ve hiltîne. Hêstiran dîbarîne, weha dibilqîne:

"Ya Reb! Tu bi çavê ef û keremê bal me yên gunehkar ve binêre. Ne bi çavê edl û qehrê. Ya Reb! Tu me bide xatirê qencen xwe. Ya Reb! Ê ku baranê dîbarîne, avan dirijîne, gîhan dixuşîne, deryayan dilivîne her Tu yi. Ger çî em ne babetê qenciya te ne, welê, mihtacê lifta te ne. Keremkarê dilbiêş derê xezîna merdiya xwe li ser mihtacan nagire. Ya Reb! çendant em dilqirêj û bênimêj in, Tu me bidî xatirê vê axa xilxîlî û van gulên pîrmîl. Amîn

## Stran

Çendant dibînî cewr û cefa û kederan  
Hêvya xwe ji Rebbê xwe ti carî mebirîne

Bixwaze ji çavan hêstiran tim dîbarîne  
Bixwaze şînê radike şâhiyê tîne

Ma kêş û keser, ah û nalîn bo ci dikî  
Piştî ku dizanî Xwedê va ye te dibîne

Berde pêşıya derdan meke şîn û girîne  
Lew halê te re baş be, te re Heq wî dişîne

Dişîne ji merdî û keremkariya xwe  
Ne ku lê wacib e, haşa ku ti heq ser wî nîne

## Çirokek

Rojek, merivek hate cem zanayê mezin Hesenê Besrî (Xwedê jê qayîl be) got:

"Maqûlê min! keçek min şev û roj bêheden digrî. Bi awaki wisa, nêz e çavên wê kor bin. Gihiştiye hedekî ku dora xwe ji hev nas nake. Tu doxtorê dilan î, zanayê birazan î, birînê hundir re derman î. Keremke carek li halê wê binêre." Hesenê Besrî got: "Belê."

Hema rabû û çû cem keça dîlkul a çavşîl. Got:

"Keça min! tu çîma wisa xemgîn î, hey û hey digrî. Derdê xwe ji min re bibêje ku derman bikim. Dertnegotî derman nabîne."

Keçê got: "Derdê mezin ê korker ji ê mîna we re tê gotin. Ev çavana axîretê de yan Xwedê dibînin weya nabînin. Heger dibînin, hezar çavê wisa kor bin di wê rîyê de hêja ye. Heger ji wê seadetê re babet nebin û Xwedê nebînin, çavê wisa kor bin çêtir e."

Hesenê Besrî digel girî got: "Em şîretkar hat in herzengirtî diçin."

Dîtina Xwedê axîretê de bi ayet û hedîsan sabit e. Lewra Xwedayê jorîn mealen dibêje: "Hinek rû wê rojê geş in li Xwedayê xwe dinîrin." Pêxember (S.A.S) dibêje: "Hun roja qiyametê Xwedayê xwe dibînin, çawa heyva çardeşevîn dibînin û tê de şek nakin. Lîbelê

kafir ji wê dewletê mehrum in. Lewra ew wê rojê wendane ji Xwedayê Mezin.”

### Çirokek

Ji tîrvanekî pîr re rojekê tîrvanên ciwan got in:

“Tu wisa bûyî ku, hêla kişandina jiha kevanê te de nemaye. Divê tu ji nav me derkevî. Lewra karê me bi te şûn ve dikeve. Navê me bi te qirêj dibe.”

Kalê, serê xwe bi ser pêşîra ponijandinê de berda, nefesek sar girt û berda û got:

“Gedeno! Hirç pîr bû, kudik bi gunan dileyizin. Fil kor bû, gêle bi şûn û cavên wî dikevin. Dûrî min bin. Lewra bi firînek min sedên mîna we li ber bayê pozê min dikevin. Yek rêzanek pîr, hêja ye hezar zarokê sîr.”

Suwarê hespê xwe bû. Tîrên xwe girtin, mîna şerê hêş ket meydana mîraniyê. Cû ber derê kemera bedenê û milên xwe ji zençira wê derbas kir. Bismillahî ya Ellah got û her dû nigê xwe li binê zikê hespê tev xist û hesp bihewa xist û got:

“Kurno! werin hela kî ji we vî karî dike?”

Kevirê sikûtê kete devê hemûyan, şîrmeqa poşmaniyê li sûretê hemûyan ket. Welê ci dikî, aşîr dira bû, şîr rija bû.

Bîhişan gotiye: “Merivê menarew mîna zêr e. Çiqas bimîne piyasa wî radibe. Karênen kalan fena fal e. Dema lêhat hişan ditewişîne.”

### Stiran

Mekev her dehlê, lewra naye zanîn  
Ku tê de şêr e ya rovî ye razay  
Ji xwe kêmîtir ti car keskî nebîne  
Meriv tenê bi xwe û karê xwe zanay  
Meke qîrfan bi keskî heta karî  
Merivan de huner û cewher wenday

Hatiye gotin: “Xwedênas çiqas pîr bin ewqas jîr in. Ën xefletkirâs çiqas mîr bin ewqas ker in. Karê merivan ci be, divê meriv li pey wî biçe. Xebata merivan gereke di rîya destxistina wî de be.” Seydayê beşeriyet û rehmeta alemê dibêje: “Ji qênciya mislimaniya merivan e, devberdانا ji tiştê ku ne meqsûd e.” Bîhişan gotiye: “Hêla mîran, çiyan ji cih radike.” •

NÜBIHAR NEXWENDIN  
KEMASİYEK E

# ŞAGIRTÊ NÛR

ABDULFERD NÛR

Şagirtê nûrê, xadimê Qur'an  
Serê xwe rake şiyarbe heyran  
Xizmeta Qur'an li benda te ye  
Were qurbanke di vê rê de can

Rîsaleyî Nûr pir bi qîmet in  
Şemala nûra Rebbê Ehed in  
Qedrê cewhera em bizanibin  
Em bi wan şûşê ku dişkên nedin

Karê şagird tev xizmeta nûr e  
Rîsaleyî Nûr di dest de şûr e  
Ew ezeb be jî bizewice jî  
Ji xîzmeta Nûrê nabe dûr e

Îmamê Elî te selam dike  
Dibê xîzmetê bi îxlas bike  
Ev ihsana Xweda pir mezin e  
Tu çiqas şikir bikî hindik e

Sî sê ayet Nûrê xeber didin  
Ji şagirtan re mîzgînê tînin  
Elî Murteza Şahê Geylanî  
Bi kerametan vê tesdiq dîkin

Pir cefa kişand Bedîuzzeman  
Bona azad be alema îslam  
Ji şagirtan re terâlî nabe  
Te helal nake tefsîra Qur'an

Bêje ya Ellah rabe serbixwe  
Li cihanê belavke doza xwe  
Tu warisê Roniya Çavan î (ASM)  
Xebatke razîke Xwedayê xwe

Ev nûr nûra ew Xwedayê Semed  
Em xadimê wê ne heta ebed

# RASTNIVÎSÎNA ZIMANÊ KURDÎ

## ROJÎN ZELAL

### RASTNIVÎSÎNA JIMARAN

0	Sifir, nîn	13	Sêzdeh	60	Şest
1	Yek	14	Çardeh	70	Heftê
2	Du, dido	15	Pazdeh	80	Heştê
3	Sê, sisê	16	Şazdeh	90	Nod
4	Çar	17	Hevdeh	100	Sed
5	Pênc	18	Hejdeh	101	Sed û yek
6	Şeş	19	Nozdeh	110	Sed û deh
7	Heft	20	Bîst	200	Dused
8	Heşt	21	Bîst û yek	201	Dused û yek
9	Neh	30	Sî	1000	Hezar
10	Deh	31	Sî û yek	1000000	Milyon
11	Yazdehan	40	Çil	10000000000	Milyar
12	Dozdeh	50	Pêncî	1000000000000	Trilyon

### RASTNIVÎSÎNA JIMARÊN RÊZÊ

1.	Yekî (Biri)	Yekem (Birinci)	Yekemîn (Birincisi)
2.	Didoyan (İkisi)	Duyem (İkinci)	Duyemîn (İkincisi)
3.	Sisêyan (Üçü)	Seyem (Üçüncü)	Seyemîn (Üçüncüsü)
4.	Çaran (Dördü)	Çarem (Dördüncü)	Çaremîn (Dördüncüsü)
5.	Pêncan (Beşi)	Pêncem (Beşinci)	Pêncemîn (Beşincisi)
6.	Şeşan (Altısı)	Şesem (Altıncı)	Şesemîn (Altıncısı)
7.	Heftan (Yedisi)	Heftem (Yedinci)	Heftemîn (Yedincisi)
8.	Heştan (Sekizi)	Heştem (Sekizinci)	Heştemîn (Sekizincisi)
9.	Nehan (Dokuzu)	Nhem (Dukuzuncu)	Nhemîn (Dokuzuncusu)
10.	Dehan (Onu)	Dehem (Onuncu)	Dehemîn (Onuncusu)
11.	Yazdehan (Onbiri)	Yazdehem (Onbirinci)	Yazdehemîn (Onbirincisi)
20.	Bîstan (Yirmisi)	Bîstem (Yirminci)	Bîstemîn (Yirmincisi)
21.	Bîst û yekan (Yirmibiri)	Bîst û yekem (Yirmibirinci)	Bîst û yekemîn (Yirmibirincisi)
30.	Siyan (Otuzu)	Siyem (Otuzuncu)	Siyemîn (Otuzuncusu)
40.	Çilan (Kırkı)	Çilem (Kırkıncı)	Çilemîn (Kırkıncısı)
50.	Pênciyan (Ellisi)	Pênciyem (Ellinci)	Pênciyemîn (Ellincisi)
60.	Şêstan (Altmış)	Şêstem (Altmışinci)	Şêstemîn (Altmışincisi)
70.	Heftêyan (Yetmiş)	Heftêyem (Yetmişinci)	Heftêyemîn (Yetmişincisi)
80.	Heştêyan (Sekseni)	Heştêyem (Sekseninci)	Heştêyemîn (Seksenincisi)
90.	Nodan (Doksanı)	Nodem (Doksaninci)	Nodemîn (Doksanincisi)
100.	Sedan (Yüzü)	Sedem (Yüzüncü)	Sedemîn (Yüzüncüsü)
1000.	Hezaran (Bini)	Hezarem (Bininci)	Hezaremîn (Binincisi)

# MEDENIYET BI ZIMANEKÎ PÊŞDEÇÛYÎ PÊK TÊT

## SEYYİD BATTAL

Îro dewletên serwer, bi hemû qewetên xwe li ser kurdan zordestiya aborî, psîkolojîk, kulturî dikan. Tirsa wan xwenasiya kurdan e. Gava wan devletên xwe saz kirin, gel û zimanên dîn qebûl nekirin. Hebûna gelên din, ji hebûna xwe re talûke hesab kirin.

Zordestiya kolonyalîstan li ser rewşenbîrên kurd, piştî cunteya leşkerî, hê zêdetir bû. Ji van rewşenbîran, yênu ku rê dîtin, xwe avêtin welaştên Ewropa. Pêşî fikra 'li ser zimanê kurdî xebat kevneperistî ye', li gor wan maqûl bû. Lê di paş de, nivîskar û hunermendên kurd ên ku her awayî ji ziman û nasnâviya kurdî dûr ketibûn, li Ewropa bi xwe hesiyan, xwe naskirin, hînî zimanê xwe bûn û li gor imkanên xwe dest pê kirin, berhem afirandin. Li derve enstituyên kurdî, sazgehêن kulturî avabûn, kovar, rojname derketin û filmên kurdî hatin hilberandin. Li her çar aliyênen welêt ji xebatên hêja wek kulîkên bîharê vebûn. Kurdên Sovyet'ê, piştî şoreşê hinekî bêhna azadiyê dîtin. Ev fir-sata ku kêm dikeve destê kurdan, ji hêla kurdên Sovyet'ê rind hate hêjandin. Çand,

huner û kultura kurdî, pêşiyê li vir şax da. Ji wergerandina berhemên cihanî, heta nivîsandina romana kurdî û ji lêkolînên akademîk heta xebatên folklorîk û di gelek warên din de alametên jîndekirinê li wir hate dîtin.

Di warê zimanê kurdî de îro li derve, li hundir tevgerake xurt heye û roj bi roj ber bi başiyê ve diçe. Li nav kurdan de danûstana kulturî, çandî sînorên dewletên serwer dibihure û ber bi alemgiştiyê ve hêdî hêdî dimeşe. Ev şabûna bi hêz wek çemekekî gumrah e û mirov dikare bibêje ku ronesanseke ziman û edebiyata kurdî dest pê dike.

Weke ku nayê înkarkirin,zanîsiya zimanê zikmakî, weke nexşen li ser kevir payîdar e û di bîra mirov de gulî dide. Her wekî ku di navbera sed-salan de, zincîr li zimanê me gerandine û kilît kirine ji, gelê me heta îro hebûna xwe bi zimanê xwe parastiye. Ji bona vê yekê merîv dikare bibêje ku zimanê kurdî ji bo mekteba kurdî bûye şewq, ronahî û çek. Alimên me di zanîngehêن Kurdistan'ê de, li ser şopa Xanî, Cizîrî talîm dane, zêhnên kulîkên welêt zaro-

kan, bi edebiyat, çand, orf û adetên îslamî û yên kurdî xemilandine û bi wî awayî kevneşopiyeke qewî pêk anîne. Çiqas ku şoreşa alfabeteyê li Tirkî'yê ev kevneşopî ji kokê de qurtisandibe ji, tasîra wê heta neslê pêşîya me xwe nîşan daye, ji bo neslê nû bûye hêz, pêtal û rêya wan ronî kirie.

Lê ji neslê hemdemên me, yên ku serê xwe li ser ziman û kultura kurdî dêşînin, wisa dixuyê ku dixwazin kurdan ji îslamê dûr bixin û -weke ku Kemalîstan li tîrkan kirin-wan nêzîkî Ewropa bikin. Di nav gelên cihanê de yên bi-qasî kurdan misliman û safînin kem in û yên bi îdeolojiyên roava xirab nebûne, kurd tenê ne. Ti kes bi navê neteweperişî yan ji bi navê îdeolojiyan xwedîheq nîne ku kurdan ji îslamê dûrbixe. Bi rastî kurd vê dema ku îdeolojiyan iflas kir û çerxa tarîxê vegeeria, mecbûr in ji xwe re rîyeke qewîm hilbijirînin û gaveke çêtir bavêjin. Gorî min rengê vê gavê îslam e.


Di dîroka cihanê de ti medeniyet nehatiye dîtinê ku pêşîya avabuna wê, karpêkên zimanî weke kîtabe û kitêb û kovaran bilind bûne û mede-

niyet bê zimanekî bipêşde-  
cûyî pêk nehatine. Medeniyet  
û ziman bi hev re pir elaqedar  
in û xilasbûna gelê kurd ji pe-  
rişantiyê, bi pêkanîna zima-  
nekî qewî û medeniyeteke  
qewî ve mumkin e.  
Ji bo vê yekê, ya li  
rewşenbîrên kurd  
dikeve; xebateke  
sistematik li ser zi-  
man, lêkolînên kûr  
li ser folklora kurdî  
ya dewlemend û  
tevgereke wergar-  
andinê li ser klas-  
sîkên edebiyata cî-  
hanê, felsefe û  
îlmên civakî ye. Di  
kurdî de valahiyekê  
mezin li ser ber-  
hemên ramanî û  
edebî de heye.  
Pêwîst e ku xwen-  
devanên kurdî, li  
alîkî bi Dostoyevs-  
ki heta Montaigne  
û ji Îqbal heta Akîf; li alîyên  
din jî, ji Seyyîd Huseyn Nasr  
heta Farabî, İbnî Sîna ve bête  
gihandin û ji van agahdar bi-  
kin. Ji bo zanabûn û xwe-  
naskirina gel, ifadekirina  
stran, derd û êşan; bi taybe-  
tî ji bo bîra kolektif (collectif-  
ve memory) lizûm dike ku zi-  
manê kurdî nesibê xwe ji qe-  
weta berhemên cîhanê yen  
klasîk hilde, qeweta wî ya ifa-  
dekirinê geş bibe.

Eger mumkiniya bahskiri-  
na hereketa xwenasî ya kur-  
dan bibe, merov dikare bibêje  
destpêka vê, kevneşopa kur-  
dan a îslamî ye. Kultura kur-  
dî pir zengîn e, hewce heye  
ku ev kultur, paşiyê xwe nas  
bike, paşê kulturên cîran, da-  
wiyyê jî berê xwe bide alem-  
giştiyê.

Netewek mîna kurd, ku  
neketiye bin tasîra moder-

nîzmê mecbûr nîne xwe we-  
ke netewên modern bihesi-  
bîne. Di bin seroktiya Gandî  
de, Hindistan'ê li hemberî  
modernîzmê li ber xwe da.  
Li gorî min, kurdan bi xwe-



nasiyê dikarin pişta xwe bidin  
modernîzmê û ji zerarê wê  
xelas bin. Bi şehadetiya ne-  
tewên cîhanê yên nûjen ve,  
kifş e ku xelasiya me bi me-  
deniyeta Ewropa û moder-  
nîzmê ve nîne.

Çawa ku tête gotin ‘însan  
bi axaftinê ji hev fam dikin,  
heywan bi bêhnê.’ Ji bo axaf-  
tinê ziman wasite ye, di rîya  
fikirandinê de gava ewil e.  
Mirovê ku difikire, pirs dike;  
Ez kî me? Çima zimanê min  
qedexe ye? Çima belengaz û  
nezan im? Û hwd. Mûsa Anter  
di xatirata xwe de, cihê ku  
behsa qedexekirina zimanê  
kurdî dike, wiha dibêje:  
“Warê lalan Mêrdîn.” Nuha  
jî, kurdî di beyankirina ra-  
manan de lal dixuye; di kur-  
dî de tinebûna karpêkên fel-  
sefi û ramanî, vê îdeaya me  
rast derdixe. Kurdî û xwen-

devanên wî di vê holê de  
bêav mane. Xebitandina kur-  
dî di radyo-televîzyonê de,  
wê tîbûna kurdan bişkîne,  
zêhna wan geş bike, qabî-  
liyêtêne wan ên vêşartî derxe  
holê û bi taybetî li  
ramanen ku wê kur-  
dan bi pêşde bibe, hê nuha xwedî ra-  
manekî meşhûr, ê  
ku bi kurdî dînivîse  
nehatiye holê. Se-  
bebê vê ya yekane  
ev e ku: Alimên me  
berhemên xwe yên  
îlmî û ramanî bi ere-  
bî û farisî nivîsîne.  
Ko ewanan weke zi-  
manê îlmê li kurdî  
xwedî derketibûna,  
nuha wê gelek  
karpêkên girîng  
mewcûd bûna û ra-  
mana kurdî jî wê ji  
îro bi du gava pêşde-  
tir bûya û ji bo me-  
deniyeta kurdî bingehêke gi-  
rîng wê hebûya. Bi pêkanîna  
zimên, kurd dikarin xwe bi  
zimanê xwe ifade bikin û do-  
za xwe ya aşitî, wekhevî û bi-  
ratîyê, ya ku hemû gelên cî-  
hanê xwedî ne, bînin holê.  
Dîsa bi vê yekê kurd dikarin  
dengên xwe li hemberî zor-  
destan di çapameniya xwe  
de, hê bi gumrahî bilind bikin,  
bîghînin netewên cîhanê û  
dîghînin jî. Weke tête zanîn,  
tasîra çapameniyê li ser par-  
lamentoyan, hikûmetan û li  
ser gelan pir e. Xebata zi-  
manê kurdî yê ku radyo-tele-  
vîzyon, roman û helbestan  
de hatiye vezingiriyê, wê di ji-  
yana civakî, ramanî, çandî û  
hunerî de kurdan bike xwedî  
navnasiyê û ji wana ji pêke-  
nînbûna “etmîş kir û yapmîş  
kir” xelas bike.

Bi geşbûna cûreyên ede-

biyata kurdî ve, bi taybetî hel-best ve, şadimanî, dram, ji-yana kurdan wê werê ifade-kirin, eva jî zimanê qêrîn, loriikan fireh dike. Nivîsandina îslamê bi kurdî, ji bo ometê pir muhîm e. Nivîsandina îslamê bi kurdî ve, ometa îslamê, ya ku hemberhevê windakirina kurdan e, dikare ji nû ve û bi saziyeke xurt kurdan kar bike.

Ko "sêwiyêñ ometê" zimanê xwe dîrokê, olê û hemû aliyêñ jînê de bi azadî bixebitînin, weke qewetdayîna ometê, wê xwe ji belengazî, nezanî û ji ciyawaziyê xelas bikin. Bi nasnaviya zimanê edebî, kulturî ve di nava kurdan de ragihandineke qewî wê were holê û bergeha wan fireh bike. Nuha navê Beko, yê ku di Mem û Zîn de derbas dibe, ku tête gotin di nava gel de mirovêñ dilreş, dexes têne bîrê. Baweriya min ew e ku, di nav kurdan de gelek şexsiyet hene ku hewceyêñ pênuşkeke qewî ne ku pê wenne teswîkirin; wek pispor, alim, çavbirçî, zalim, xesîs û hwd. Ev şexsiyetêñ hanê nav gel de niçikin û neynika komelê ne. Gel, bi mirovêñ niçika xwe nas dike, têt naskirin. Bi xebitandina zimanê kurdî, di tiyatro û ceribandin (essay) de, hisên kurdan yên bi zimanêkî qewî werin ifadekirin. Annabel Lee, Cîmrî û Înce Memed' ên kurdan ji bo pênuşen qewî amade ne. Pozê me hêvidarê bihara nû ye, ya ku rewşenbîrêñ dilmезin bi "zimanê ronesansê" karpêkan bînin holê. •

#### KITÊBËN ME YËN NUH

- Nimêj Dikim
- Bedluzzaman'ın Hayatı
- Bedluzzaman'ın Volkan  
Yazları

## SEYDA DILKANI

Seydayê Yehya Mela  
Te agir berda dila  
Wê peymana te da me  
Ew jî bû barê mila

Barê me, barê loka  
Di bin de têne çoka  
Di cî de hêz didin xwe  
Difirin wek firoka

Çavê me l'rê westiya  
Gelo li ku ma vîya  
Me got û em metel man  
Me go qey bûye keya

Seydayê Şêx Omera  
Li cem me tacâ sera  
Berê xwe ca vir da ke  
Bavê berikê pera

Birê hêjayê delal  
Welatê şox û şepal  
Gelê me yê pelçiqî  
Jê dere pir nalenal

Niştimanê b'nav û deng  
Li xwediya bûye teng  
Çima wan tê nemaye  
Mejî tije bûye zeng

Heta ew vî zenga ha  
Neşon, navêñ dera ha  
Tev bi hev ra nebin yek  
Ti car ew nabin reha

Hey Dilkanî bargiran  
Beje bi dev û diran  
Yan ne di paşerojê  
Dê l'te bike nifiran

Nifirê wan giran in  
Lewra gelek nezan in  
Bo van nekî xebatê  
Mela fedayê wan in

# PÎRA HEDROY

## KOYO BERZ

Wextê di pîrê da dewda Hedroy bena. Namey na pîri wilayetandê Riha, Diyarbekir û ê Semsûrî (Adiyaman) ra vila beno.

Heta wextê do winî yeno ki, bahdê merdeni da na pîri, nameyê ci sînoranê nê wilayetan dirneno û şino cayandê zahf dûran.

Kotî cayê di cinî an jî pîrêda hari û vitvitoki bena, vanê zey pîrda Hedroy a.

Pîrda Hedroy ser ra, kesê do vitvitok, har û vêşî qiseykerde nêbeno. Gorey vitviti û qisey kerdeni da xo, çiyo ki vana jî ci rê qalibê vînena û ümiş kena. Zahf gerekerdena qeçkan ra hes kena û wazen a tim gerezê ïnan pêrandê ci heti bikero û ïnan bido kuwateni, kotekkerdeni.

Rojê mi enbazêdê Hedroyij ì ra perskerd va: "Enbaz, mileti zahf qalê pîrda Hedroy kena, û zahf çî mi aşnawit o. Ti şenê hebê mi rê qalê ey bikerê, ka pîrêda senîni bî?"

Enbazê minê Hedroyi jî va: "Sere û çiman ser, ez do kilm to rê bahs bikera" û wina domna:

Wextê di pîrêda Hedroy bena. Zahf teşqele, welwele, vitiviti, gerekerdeni, meselan pêşanayeni, qeçkan hêrskerdeni û qiseykerdeni ra zahf heskena û zewq gêna.

Roja ki nê çiyan nêkero, a roji û şewi nêweş kewna û kena biteqo. A şewi diha hewne ci nîno û nêrakewna. Kifcî û nêweş a nê çiyan bena. Merdimê do kîfçiyê cixare

şimiteni senî cixare nêşimo dano ci sere ro, ê ay jî winî dano ci sere ro.

Na pîra ma ya Hedroy, teniya bi seredê xo ya, banê do werdêk di jiyanê xo domnayê.

Bê qeçandê dewda Hedroy kesnadê ci çinêbi.

Qandê ki bêwihêr û bêkes bî, heme dewijan ê Hedroy ci ra heskerdê, destê ci tepiştê, ci rê wihêr vijiyayê û winiyayê ci ra.

Zeki bewnî rê may û pêrdê xo ra, winî yarmetey a ay kerdê, ci rê werd û ardû berdê, çîna herînayê û dayê pîra. A çiyê ra mahrûm nêverdayê û çiçî ci dest ra biyameyê kerdê.

Roj hîrê-çihar finî na keydê xo ra vijiyayê û şiyê kewtê kuçandê dewda Hedroy miyan. Geyrayê, çimkerdê û cayo ki qeçkan kaykerdê wijanan diyê. Koşeyê di, yan jî cayê do talda di xo nimitê. Xeylê winiyayê qeçkan ra û ê xo çiman ver çarnayê. Jew

bi jew sinasnayê, ka lajê kê yo an jî kamcîn ê ciyo. Qandê ki wextê gerekerdeni şaşeyê nêkero û nêkewo feqi. Heme xo çiman ver a berdî ardî û sinasnay kam o kam niyo, tepey a, sereyê xo vetê, veng kerdê a qeçkan û vatê:

"Hû hû... qeçkêno cîq. Ez fina ameya.

Hû hû, qeçkêno hû hû, cîq cîq, qeçkêno cîq." Çend finî pê ser ro cîq û hû hû kerdê Qeçkan hesê xo nêkerdê. Qandê ki qeçkan



heti biyê û ïnan kotekî werdê.

Labirê pîra ma karê xo winhi rind û weş kerdê, û winî pilanê xo viraştê, ki çare çinê bi pirowaqasiyon nêviraz o û qeçkan niyanco fetilnayeni û sî kerdeni ser. Jew bî jî finî pilan viraştê, di finî pê ser ro gereyê qeçkê pêrdê ci heti nêkerdê, ki mesela dimi nêkewê û pey nêzanê sûcê a yo, a ya rehat nêvindenâ. Ü piyê qeçkan ci rê nêvajê tî ya zûrî kena.

Fina sifeyenî hû-hû û cîq-cîqi kerdê, kes vi-jara û pa alaqedar nêbiyê.

Nay çend finî diha hû-hû û cîq cîqi kerdê winyayê nêbeno.

No fin qiseyê xo domnayê vatê:

“Qençkên o, şerên o qerqaşen o.

Milçewt, paştî xozikinêno.

Ez zana, şima zahf tersenê.

Nêwetanê mi di kaykerê.

Ez pîrkekê da di nameya.

Şima hemini rê meydan wanena.

O ki şima werd o şima pirnikî ra ana

Şima rê tim qequbo kena.

Şima heme min ra tersenê.

Nêwetanê bêrê mi bifetilnê.

Wexto ki mi vînenê qutifêne

Quli çinêbena şima dekewê.

Ez pîrkek a pîrkeken a

Belayê seredê qeçken a.

Qeçkan hemini rê meydan wenana.

Zeriya ïnan qutifnena

Qeçkî pê ro min ra tersenê

Zanê do şan di kotekî bûrê.

Ez se vana cewabê mi nêdanê.

Qeçkê winay cana di nîvîneyêne.

Qeçkê dewda Hedroy zahf şîriniyê.

Cana di nê qeçkî nêvîneyenê.

Qeçkê dewda Hedroy qeçkê min ê

Ê mi rê bedelê maldê dinyayê”

Him dana nal ro, him dana mêtro, him weş kena û him jî hêş kena, him virazena û him jî şahtinena, labirê karê xo weş kena.

“Zahf weşdê mi şino kaykerdana qeçkan.

Emrê mi pa derg beno bêgumman.

Ez nêdana ïnan rê aman

Namey mi villa beno kewna fekan”

Bi hêrskerden a, bi pirawaqasyona û zixt-kerden a qeçkan ana kayda xo ser. No hesab a qeçkan rê cîqkena û qeçkan xo ser ro kom kena.

Qeçkî jî mecbûr manenê û pîr a ma sî kenê û fetilnenê.

Hergi fini pîri, bi zart û zûrt xo qeçkan des-ti xelisnena, reynena û remena.

Lê qeçkî jî, qandê kişteni, dirbetinikerdeni, seqetkerdeni an jî cayê dê ci ro dayeni sî ni-yerzenê ci. Nêwazenê cayê dê ci bitewnê. Bes wazenê ki ay bitersanê û a jî ci ver bire-mo, ki bişê kayanê xo bikerê û bidomnê.

Bahdê sî kerdeni û remnayeni, beno şan na dana piro şina pêrandê çend qeçkan heti û ge-reyê ci kena. Pî veydan o qecdê xo, qeç çend itîraz keno jî, çend vano mi nêkerdo jî, çend vano a ma ra fek nêviradana û ma rehet nêverdana jî, pî fina dano piro û ketokî keno.

Xeylê wext, bi no hesab a na mesela winda domnena.

Rojê çend piyê qeçkan yenê pê heti û vanê: “Rojê niyo, didi niyo ma yê nê qeçkanê xo kotekî kenê û qandê na pîri danê piro.

Labirê bi raştey ma yê nêzanê sûcê nê qeçkandê ma yo, yan ê pîrda ma yo.”

Nay ser ra, nê qerarê xo danê, ki şirê ta-qîb bikerê, ka sûcê qeçkan o an jî ê pîro, yan jî senî beno senî nêbeno. Ü ci hesab a û qandê çiçî nê qeçê nînanê nay sî kenê û fe-tilnenê.

Piyê nê qeçkan, rojê hergi jew koşeyê di vindeno û rewşî bi çimandê xo ya vîneno, ka o yo senî beno.

Vînenê ki hendê misqalê sûc û gunayê qeçkandê ci çiniyo. Pîra cî ya rehat nêvinden a û qeçkan zixt kena.

Ey ser ra pîra ma çend şina gereyê qeçkan pêrandê ci heti kena jî, piyê qeçkan qeç-kandê xo ro nêdanê û ci rê vanê. “teba nêbe-no, ma ïnan tembe kenê wa to ra fek viradê û to si nêkerê.”

Pîri winêna kes o diha qeçê xo tahzîl û kotekî nêkeno û a ya jî zey verî ci ra zewq û ne-şe nêgêna. Ü kêfê cî yo nîno ca.

Ney ser ra zahf qehrêna, nêweş kewna û rojê mirena.

Pîra ma mirena, labirê namey ci û mese-ley ci ma rê diyarî manenê.

O roj o no roj o yenê vateni. •

# DÊSÊ BÊ SIWAXÎ

Ö. FARUK ÇETINKAPLAN

"Dewijandê mirê"

Dewi ji

Erdan di rençber  
Deştan di şivaneyê  
Amnanî rojî ver  
Rojdihîr di palî  
Germê leyelanî di qazme  
Puk û serdî di peme  
Xeyman di bi mengana  
Adana di, Soke di  
Seranser gulbê xeyma

Xortî

Beton kirêşenê Îzmîr di qata ser  
Ariq rîj beno çare ra  
Xercê betonî sero beno çina

Xebatkaryê yenê çaykar!

Çayênen dek wa demin bo  
Sifte

Dew re qal kenê  
qeçkan ra...

Filanxes merdo/Veyve kerdo bêvankesi  
Çendna amê dinya  
Namê juwer Bewran, juwer Xezal...

Şew

gehwe di  
Îzmîr di  
qalê dew kenê çay ser  
Çaykar; Çaya tezeki!

Siat diwêsi mojnena

Hewn nêkewno îna çim  
Jiwerî di xiyalê may xiyalê pî  
Jiwerî di xiyalê waştî  
Jiwerî di derdêno bêderman  
Hinî pal danê cayan ser  
Heşeretî miyan di  
Ca bi ca pîrikî  
Dêsê bêsiwaxî  
Ne tiya di ne wija di rehetey  
Coyey kezaleteya  
Kezaleteya marê  
Birayê mi dewi jê mi.

# MEKTEB

ELÎ HEYDER NÛR

Xwendin ji bo pêşveçün e  
Ne ji bona zilm û xwûn e  
Îro tijî teres bûne  
Bes e bira ji xew rabe  
Bêje xwendin ewha nabe

Neyarê nezanê ilm e  
Li devê wê dixe kulm e  
Îlm were diçe zilm e  
Li ber nezaniyê rabe  
Bêje mekteb ewha nabe

Mekteb bûne kerxane tev  
Xinzîrtî ye bi roj û şev  
Namûsê re pir şerm e ev  
Gelo halê me wê çabe  
Bêje xîret ewha nabe

Xîret namûs dike hewar  
Pirrên însan bûne xewar  
Qet şerm nakin bûne dewar  
Bira êdî ji xew rabe  
Însanetî ewha nabe

Di sîfetê însanan da  
Pir bûne heywanê Xweda  
Wan derê xwendinê dada  
Bira bes e ji xew rabe  
Mislimantî ewha nabe

Ev mekteb tella deccal e  
Em ketinê heftê sal e  
Me jibîr kir bav û kale  
Li ber deccalîzmê rabe  
Ev koletî ewha nabe

Ji Xwedê re spas bike  
Belkî ew me xilas bike  
Dinyayê qenc çavnas bike  
Bira bêje Ellah rabe  
Ev teralî ewha nabe

# ROJANE

## ALİ KARADENİZ

### 1 İlön 1993

Îro baran bariya. Min ti  
tişt ji vî bajarî fam nekir jixwe;  
gavek wî gavekê nagire. Vê  
sibê gava ez ji mal derketim,  
asîman çiksayı bû. Îro yekê  
îlonê ye û hê germa tebaxê  
her tiştî diqemirîne. Ji ber  
vê, barîna baranê qet nedî-  
kete bîra meriv. Meger ez li  
gor mewsimâ welatê xwe di-  
çim; vir Stenbol e. Eger bîs-  
tekê rojek pir bi tîn he-  
be ji, bîsteke din dibe  
ku bibe baran.

Îro ji, li gor ku hê çâ-  
xa taştiya jî bû, tavek  
pir bi tîn hebû. Loma  
gava ez li otobosê si-  
war hatim, min çavê  
xwe li aliyê sîdar, li cih-  
kî vala gerand. (Berê  
min ceribandibû, ji ber  
vê min zanîbû bê wê roj li  
ser kîjan aliyê otobosê be.) Li  
hêla sîdar min cihkî vala  
peyde kir, lêhema min zanîbû  
wê rûniştin ji min re neserife.  
Lewra gaveke din, pîremerek  
yan jî pîrejinek ew ê were û  
divê ez ji ber rabim. Loma, ez  
bêl dilê xwe li wî cihê vala  
rûniştîm. Lewra cihê ku me-  
riv dê jê rabe, divê meriv lê  
rûnenê. Dilê min qet tehe-  
mûl nake ku pîrejinek yan jî  
pîremerek şipyayî bimîne û

ez rûniştîbim.

Bi rastî pir caran ev cih-  
dan bi min giran ji têt. Lew-  
ra rêuwiya min pir dirêj dom  
dike. Ez jî di rêuwiyye de, ji bo  
xwendinê tim pirtûkekê, yan  
jî kovarekê bi xwe re hildig-  
rim. Gava firseta rûniştinê di-  
keve destê min, ez dixwînim.  
Lewra ev ‘zemanê’ giranbiha,  
tenê carekê bi dest dikeve, ji  
ber vê, divê bi arzanî meriv ji

vedanê xuya nedibû. Naçar  
ez rabûm derketim.

Baran baş dibariya. Hêdî  
hêdî kincên min şil dibûn.  
Qonaxa otobosê, bi meşê  
deh deqîqe dikşand. Heta ku  
ez gihiştîm, ez bûm av. Ba-  
rana Stenbolê meriv dibê qey  
piçkî siltir e, ji barana me.

Ez dixwazîm li xwe mikur  
werim ku ez tim û tim ji ba-  
ranê tırsiyamim. Tête bîra  
min, çaxa ku ez zarok  
bûm, xaniyê me yê ji  
kerpiçan zivistanî dilop  
dikir. Gava baran pir bi-  
bariyaya, avê ji xwe re  
rêyek vedikir û dihate  
hindurê xênî. Loma  
nuha barîna baranê, be-  
rî her tiştî dilopan tîne  
bîra min. Ji ber wê ye  
ku navbera min û ba-  
ranê zêde tîneye. Herçi xâ-  
niyê me nuha nema dilopan  
dike ji, nava min û baranê  
ne piir xweş e. Lewra ez di-  
zanim ku nuha pir mirovên li  
bin beranê mane hene. Li  
bin baranê ne û mixabin xâ-  
niyekî wan ê dilopan bike ji ti-  
neye!

Lêhema dîsa ji dibare ba-  
ran. Wê bibare helbet; lewra  
zarok bang dikinê:

“Baranê bibar bibar  
Çivîka genmê te xwar.”

dest bernede. Eger ev rêuwi-  
rojek du roj ji bûya, min dê  
gotiba, de xem nake. Lêbelê  
ne rojek û ne du roj e, gava  
ez dihesibînim, mehekê de  
heftê û heyş saetê min dibî-  
hure. Lêhema bi min giran ji  
were, ez dê ji ber wan rabim.

Axir min qala baranê dikir.  
Baranê piştî nîvro dest pê  
kir û heta êvarî berdewam  
bariya. Ber êvarî, berya ku ji  
kargehê derkevîm, min xwe  
piçkî ragirt. Lê ti nîteke wê û

## 2 Çiriya Paşin 1993

Îro çend roj in, ez li hawîrdor çavêن xwe li çivîkan digerînim, lê mixabin ji çendekan pêvtir bi ber çavêن min neketin. Gelo ma em ê ji çivîkan jî mahrûm bimîn? Di vê cihana kambax de, roj bi roj mahrûmî pirtir dibe, ez vê dibînim, lêhemâ ji çivîkan jî mahrûmbûn?.. Xezebeke mezin e.

Bi rastî kembûn, an jî nebûne çivîkan, gunehê min tînê bira min. Eger îro ez çivîkan pir nabînim, vaya gunehê min e jî!

Berya nuha bi çend sala bû, nema tê bîra min. Rojekê em, yanê hemû zarokên gund, em li hev civiyan û me berê xwe da ber devê çem, nav daran; dilê me bijiyabû hêkên çivîkan (!) Roj xwe baş berdabû xwarê, hema hema li ber avabû. Em birrek zarok bûn (birrastî ku ez bibêjim 'birrek gur' wê me çêtir bide nasîn), temenên me di navbera 8 û 12'an de bû. Gava em nêzîki çem bûn, ji wîj wîja çivîkan, guh ji yekî dicûn. Wêxt nêzîki êvarî bû, ji ber vê, hemû çivîk ji çolan, ji deran hatibûn hêlinêن xwe û ji hevûdu re behsa serpêhatiyêن xwe yên wê rojê dikirin. (Rebena ma wê ji kû zanîbûna ku serpêhatiya malkambax wê hê nuh were serê wan!) Gotinek heye, dibêjin: "Bela êvarê". Em jî wê rojê nola bela êvarê bûn ji çivîkan re.

Gava çivîkan em dîtin, wîj

wîjan wan bilindtir bû. Tê bêje qey zanîbûn ku ev hatin ne ji bo xêrê ye. Jixwe wisa jî bû.

Nuha ez di ponijim, eger wê rojê me zanîbûya ko ev talanî wê çivîkan ji me bi xeyidîne, yan jî wê me bê çivîk bihêle, gelo me yê dîsa jî ew qetlîama kiribûya? Na, ebed na!

Her çendekan ji me hucumî darekê kirin û em li hêlinâ geriyan. Çivîk hemû tevdé, ji cihêن xwe bi hewa ketin.



Me ew hêkên xweşik û narîn, yek bi yek ji hêlinan berhev dikirin. Çivîkên reben, li ser serên me, bi jan dikirin çîkeçik û lê em bi kêf û şadî, em bi wan dikenîyan. Nuha ku tê bîra min, gurêzî digre canê min.

Gelo nuha ev mirovên ku derketine nêçîra mirovan û weke ku çawa me çivîk ji warêن wan, ji aramgehêن wan diteriqandin, wisa jî, yên ku mirovên reben, ji warêن wan dihecirînin, gurêzî digre

canê wan? Min ne bawer e. Lewra wê gavê gurêzî nedigirte canê me ji! Nola roviyekî bêbext, ne hiş, ne nezaket, ne ji tirs hebû di dilê me de. Wê gavê dibe ku mizawirtiya 'zaroktiyê' em kerr û kor kiribûn; lê gelo ji van qesabêن zarokan re ci tê gotin? Zarokan li ber çavêن dê û bavê wan û li ber çavêن cihanê giştikî, mengene dikin û goşte wan radiqelînin û bi diya wan didin xwarinkirin! Zarokên yek salî, yek mehî, hetta yek rojî... serjedîkin, gule dikin!

Wê rojê me çend hêlin tazî kirin, yanê me çend guneh kirin nema tê bîra min, lê ko ez vê yekê bêjim, wê texmînekê bide, bê ka me çend hêlin talan kiribûn: Piştî talanê, gava em li hev kom bûn, me dît ku her yekî ji me kumek berhev kiriye.

Min û lawê xwuhâ xwe me para xwe tevlîhev kir û em vegeriyan malê. Mezinêن me bi me re xeyidîn lê ci fêde... Tewr ku me qala xwarina wan hêkan kir, hê bêhtir bi me re xeyidîn. Edî me yê çibikira ji wan hêkan? Ji avêtinê pêvtir çare tinebû. Lê mixabin mizawirtiyeke din hate bîra lawê xwuhâ min: Pir meraq dikir (!), gelo gava ku meriv hêkan bi yek carê li dîwêr bixe, hemû bi yek carê wê bişkestana? Dîwar zer hate boyaxkirin...

Piştî vê talanê, gunehêن me yek bi yek hatin pêş me. Pêşî ava çem çikiya, dûvre dar hişk bûn û vayê nuha jî ez nema çivîkan dibînim. •

# MONA ROZA

SEZAI KARAKOC  
Ji tirkî: HOZAN OFLAZ

## 4. Û Mona Roza

Di roniya kulîlka peyamber de bigere  
Li destê min ên naçar ku b'alyê te dirêj in  
Sîrre xwe dibêjim ji masiyêñ wefadar re  
Bi tenê dê ew bigrin vê dînyê de cihê min  
Li heykelê min ê ku porê xwe yê araste  
Daye bayê û çûye li pişta zarokekê  
Di roniya kulîlka peyamber de bigere

Çînek ji destrastê min ket aveke girrekî  
Ü qırka min givaştin tiliyêñ zirav dirêj  
Mûk ji pora te ket ser axa min a gunehkar  
Çi b'te hatiye Roza, tu ketiye derdekî  
Wisa pijîn ramanêñ ku wek nankî ezîz in  
Bila qehrbin ew darêñ noelê û manolya  
Çînek ji destrastê min ket aveke girrekî

Ez vê şefqê derdixim û davêjim çemekî  
Her tiştem bila yên we bin yên we serên birri  
Tifinga ku min gulkê êxistiye devê wê  
Dimre dema xewa wê de digrî pindepîrek  
Wek kîsoyê gunehêñ xwe l'pişta xwe bar kirye  
Giran dibe hebûna min li pêşya mirinê  
Naxwe ez davêjim vê şefqeyê bi çemekî

Wek pisîkan distînin evan zilaman bêhnê  
Û her şev xwe b'balîfan dixîşînin pisîkan  
Rojêñ ku behran dikin bextiyar pir kin dibin  
Kulîlkêñ bi jehr û reş ên nehatne firotin  
Ji zilam û pîrekêñ jibîrbûyî r'dijmin in  
Çavêñ ahûkê d'kevin nava berfa helyayî  
Û wek pisîk distînin evan zilaman bêhnê

Tenêtî qasî xwelya çixarekê tenêtî  
Û ketina axê di xewnê weke marekî  
Me j'te re Mona Roza zaroka kevirîn hişt  
Destê te de dirankî masiyên xwedîdasî  
Weke bîranîna te mezin û nuh û tarî  
Weke bîranîna te karê Xweda û şeytên  
Û biqasî xweliya çixarekê tenêtî

Ez ê îro tenê bi baran tehmûl bikim  
Bi barana dîwane ku daye qirika min  
Ez ê bi pirçê xwe ji dîkkî pirtir bawer bim  
Ez ê bawer bim bi vê barana belafiroş  
Ez ê ruhê xwe bikim ala û teslîm bikim  
Du destên zilamekî bi baran daleqandî  
Ez ê îro tenê bi baran tehemûl bikim

Bi roniya trêñ û tavê kişandina te  
Û bajarkî xulqandin ji te bi navê Geyve  
Keştîke parçebûyî û yelkenek çiryayî  
Li stiranek bêdeng tê gotin zêdekirin  
Û paşê nayêkuştinkî qozîkê de kuştin  
Û xelaskirina vê stirana xelas nabe  
Bi roniya trêñ û tavê kişandina te

Divê ji te re bêjîm weke gotina talî  
Ku melekê tawûsek ketiye nava min de  
Ketiye nava min û pirçê xwe ji xwe kirye  
Divê ji te re bêjîm weke gotina talî  
Ku nava min de tawûs yek bi yek winda bûne  
Û j'min re bi tenê du perrê spî hiştine  
Divê ji te re bêjîm weke gotina talî

Di roniya kulîlka peyamber de bigere  
Li destê min ên naçar ku b'alyê te dirêj in  
Sîrrê xwe dibêjîm ji masiyên wefadâr re  
Bi tenê dê ew bigrin vê dînyê de cihê min  
Li heykelê min ê ku porê xwe yê araste  
Daye bayê û çûye li pişta zarokekê  
Di roniya kulîlka peyamber de bigere

# MELAYÊ BATEYÎ Û HELBESTEK WÎ YA NEWESİYAYÎ

## TEHSÎN İBRAHÎM DOSKÎ

Xwendevanê hêja, eva li jêrîn, helbesteka nebelavkirî ya hozanvanekî kurd ê bi nav û deng e; ew ji Mela Huseynê Bateyî ye. Bateyî navekî geş e li ser berperêt dîroka edebî ya kurdî. Belê mixabin zanînêt me li ser jîn û serpêhatiya wî gelek dikêmin û heta îro pîraniya berhemên wî li bin toz û xubara des-nivisan mane.<sup>1</sup>

Divê delîvê de me pêxoşe helbestekê ji helbestêt Bateyî ji mirnê reha bi keyn û bi dânnîne jêr destê rewşenbîrêt kurd belkî bibte pal-veder ji bo wan ku li şînwarât bab û bapîra bi-zivrin û ji bin toza jibîkirinê bidine der. Ev hel-besteya hatiye nîvîsîn li sala 1205 mişextî 1790 zayînî bi destê Şêx Ebdilletifê kurê Yû-nisê Şoşî, ew ê bi nasnavê Seyfî tête nasîn, li gundê Şoşê, ew ê dikevîte nêzîkî Akrê li de-vera Behdîna.

Melayê Bateyî dibêjît:

Ey dilo mizgîniya min, hatî paşahê Heleb Van li winda girtî exmayê ji ber toxâ qeseb (Bisbikê vî ku di gohtin ey îcab ey bê edeb)<sup>2</sup> Dil ji min bir xemz û naza girtim ez mîrê ereb Dil mi da û qet çi nakit lê heye fikra serî Şeh nîqab havêt û meşya, hate der sîmaperî

Hate eywanê ji qesrê şu'le da mexribzemîn Avirek da 'alemê wê tîrnakahî qafpirîn Zulf bi dêmî da hejandin ta bi ta nasîn bîvîn Lew nesîmî bhinreva bû bir heta maçîn û çîn Merheba ateş enî suht in ber û dar û dirî Şeh nîqab havêt û meşya, hate der sîmaperî

Bexçeyek wê çêkirî Xaliq ji min (ra) qurmizi Hem rihan û hem binefş û çîçek û gul tewizî Dest û gerden bûne yek aloziyan zulf û kezî Min di xewnê da ku dî xûna dilê min jî tezî Ger ci xa'ib soreti daîm ji min lê hazîri Şeh nîqab havêt û meşya, hate der sîmaperî

Ez nizanim hîkmeta van xemz û naz û awiran Kes ci nabînit çikan û şubhetî sed keyberan Kun dîkin mîlak û cerga ez giran û ta giran Min veheykin (ey) gelî yar û bira û haziran Ez birîndarê du tîra qet hilînanim serî Şeh nîqab havêt û meşya, hate der sîmaperî

Tole ê dergahê yar im her vema me l'intîzar Belkî carek bête qismet moçeyê dergahê yar Suhtime ez wê xeyalê ez jibîr nakim çu car Destî nadit bo me ey dil suhbetê boseguzar Bes bisojin berde min vêkra ji rengê agirî Şeh nîqab havêt û meşya, hate der sîmaperî

(Şukru lîllah) min ji hubba dilberê ava ye dil Sal û maha daîmen min hem mehî enqa ye dil Car xedok e, car melûl e, car (bi) keyf û şâ ye dil Gahê girtî gahê sotî gahê bênen perwa ye dil Min ji mîje teîre dil (Bateyî) qalib firî Şeh nîqab havêt û meşya, hate der sîmaperî

- 1- Hijmarek ji helbestêt Bateyî me yêt kom-kirin, hîvîdarin li zûtirîn dem di dîwanike taybet da bidine çapkirin.
- 2- Ev rêz di destnivîsê de nexoşxwîn bû, nizanim mebest pê çiye?

# MAF NE JI ALÎ ÎNSANAN, JI ALÎ XWEDÊ VE HATIYE DAYÎN

## ABDILQADIR MÊRDÎNÎ

Mirov, azadane ji dayika xwe dibin û ji bo serrastkirin û serwerkirina dad û azadiyê hene. Lê hema dema em li dîrokê dinihêrin, em têkoşîna nabeyna zilmkaran û zilmxwaran dibînin. Zilmkaran her çax û her dem qeweta wan gihîştîye kê; hişê wan, mal û samanên wan, can, namûs û axêñ wan ji destê wan bi zor girtine. Yanê talan kîrine. Mazlûman jî di van hengavan de hatine bal hev, hêzên xwe yek kirine û serhildan, qiyam û ihtiîlalan pêk anîne. Ev rastîyek mezin e ku ev berxwedan hemû, ji bo parastina mafan e. Ji bo jîyaneke azad e. Ji bo, serwerîya edalet û wekhevî û jîyaneke li gor van e. Têkoşîna di nav Habil û Qabil, ya nav ya-hûdî û gelê Filistîn, ya nav rejîma cumhûrîyeta tirk û gelê kurd, hemû ji vê babetê ne.

Xesbkirina welatên ku gelê wan li ser dijîn û zimanê ku ayeteke Xweda ye, înkarkirin û qedexekirina wî, ne li gorî hîkmetê, ne li gorî İslâmîyetê û ne jî li gorî însanîyetê ye. Lewra, em vê rastîyê gellek xweş dizanin ku, mezinatî ne bi nijad e û ne jî bi dewlemendiyê ye... Mezinafî encax bi kemal û teqwayê

ye.

Divê însan azadane kari bin bifikirin û fîkr û ramanêñ xwe neqil bikin û dîsa karibin bi hemhêzirêd xwe teşkilatan çêbikin. Eviya maf û pêwîstîyeke huqûqî ye. Ev maf ne ji alî însanan ve, ji alî Xwedê ve bi însanan hatîye dayîn. Bi zordesî û kotekîyan divêt ji vî mafî re neyête astgenbûyîn û dîsa divête zincîr û kabik li vî mafê însanan neyête xistin. Herwekê viya di manayek gelempêrî de netewan; her yek anagora fermadarî û idarevaniyê, divê xwediyêñ mafêñ xwe yêñ fermî, aborî, komelî, çandî u leşkerî (arteşî) bin û karibin pêşeroja van mafêñ xwe tayîn bikin. Eviya jî pêwîstiya fitrat û xulqeta însanan e. Mirovatî jî wiha dixwaze. Ev rastiya divê li qeyda neyête xistin. Em ne bawermend û parêzvanê Mîsaq a Millî û ti-xûban in. Lê em veya dibêjin: Xespkirina mafêñ milletekî û înkarkirina zimanê wî, înkarkirina ayetek Xwedê ye. Dîrokê evanan jiyand. Di sala 1930'yan de mirovekî peyvek kurmancî xeber bide 1 quriş pere ceza jê dihate birrandin. Ew rojana yek meşînek (mîh) 5 quriş pere dikir.

Mirovekî ji bo ifadekirina me-rama xwe ger pênc peyv bigotina, cezaya wî bi qasê behaya meşînekî bû. Antîkebûna vê zilmê ji antîkebûna kufra wî zemanî têt. Yê li hember vê zilm û tadeya bêhem-pa û nexuyane têkoşîn didan bi xwe, ayetek Xwedê ihyâ dikirin. Daxwaz û merema şol û kîrinêd me ev e. Ne tiştekî din e.

Belê, dema, Yezdan em însan xuliqand (afirand)in bi fîkr û ramanêd me neşêwînî ku, em fro rabin bi nijad, an netew, an jî bi jin û mîrtiya xwe bipesinin. Ev tiştekî dervê vêna mirov e. Mirov ji tiştên ku dervê irada wî tê kîrin ne mesûl e.

Perwerdeya ku heftê sal e rejîma komera tirk daye me, ji vê sedemê ye ku li ser îdeolojiya rehperestiyê ye. Herkes pir hindik para xwe ji vê îdeolojiyê sitandiye. Herçiqasî ji miletên dervê tîrkan be jî ji ber perçiqandin û qompleksa piçûkatiyê, yêñ xwe dispêrin tirkîtiyê û bi netewa tirkîtiyê dipesinin ne hindik in. Eviya jî, encama perwerdekirin û talîma vê rejîma rehperest e. Ez ê niha xwe bispêrim lêborîn û efûkirina we û çend lib nimû-

neyên van helwest û kirinêd rûreşiyê bidim ber çavan:

1- Serokdarê partiya CHP, Mahmut Esat Bozkurt, li bajarokê Odemîş'ê di pêşkeşkirinek axaftina xwe de wila digot: "Yegane efendî û xwendiyê vî niştimanî, gelê tirk e. Yêne tirkêna safxwîn û nijadîtirk in, yek heqekî wan heyê li vî warî, ew jî benderwarî ye, xulamîfî ye. Bila dost û dijmin, heta bila çiyan jî vi-

sanan û şeytanen welidîne." (Pirtûka Kurt Türkleri) û her weke van gotinêñ bê esl û beraday hê pir gotin ji alê van rehperestan hatine gotin.

Gellek sal in ku bi hemûşkî ev serok û generalan em idare kirine. Û hê jî ew me idare dikin. Di bin ronîya (!) van gotinan de qanûn û destûrên ku hatine derxistin, ma ti car biratî û wekhevîtiyê pêk


hatine.

Gelo ma çîma di damezrandina sazûmana Komara Tirk de, meclîsa yekemîn de di nav gelan de (kurd-tirk) ewqasî hevqetayî û cudayî tinebû? Lewra, hinek be jî piçik bêhna îslamê ji wê meclîsa yekem dihat.

Di dewra damezrandina meclîsa yekem de, yanê sala 1920, 20'ê meha nîsanê de TBMM'ye de 72 endamê kurd hebûn û evanan temsîlkariya gelê xwe dikirin. Di vê meclîse de endamê Erzirom'ê Huseyn Ewnî Beg, di komelisan yekê de wiha got: "Di vê kursiyê de peyivandin heqê du gelan in. Yek tirk yê din kurd in." Ev gotina ji hêla endamên wê meclîse bi kîf hate bersîvkirin û hemûyan li çepikan xistin. Yanê ji hemûşkan destek û arîkarî dît. Heta sala 1922, meha sibatê de bi pejirandina piraniyêñ endamên kurd muxtariyet hate naskirin. Belê li hember 64 endamên nexwaz, 373 endaman ev muxtariyeta bîrayên xwe pejirandin û "Destûra nîvrizgariya kurdan" derxistin. Lê ci mixabin e ev destûr di dîroka Komara Tirk de ya hem yekem e, hem jî ya dawîn e. Serokê meclîse ji ber ku ev destûra neserifand, ji endaman jî destek nedît, heman ew meclîs fesix kir.

Belê, iro çareserbûna pirsîgirêka kurdan, ji ben ferqêni di navbera meslîsa yekem û ya duyem pêş ve têni. Ev jî, ji ber ku bîrûbaweriya rehperistî hate damezrandin. Dîsa ji ber ku berjewendiyêñ gellemperî yê milletê bêhtir, berjewendêñ şexsî û kesanî yan jî dervehiyêñ biyanî asas hate girtin.

Pirsîgirêka kurdan ji çew-



ya wiha bizanîbin." (Rojnama Milliyet, 19 İlôn 1930)

2- "Kurdan ha? Yêne weki gîha bi axê ve girêdayî ne, ji wan re kurd tête gotin. Kurd, bi axê têne kirîn û têne firotin. Ewan, malê xwedî axan in." (Albayê emekdar Naşit Hakkî: TKAE Dersim Kitabi)

3- Generalê jikarketî yê rejîma tirk, Nazmi Sevgen jî di pirtûka xwe de wisa dibêje: "Kurdan; ji tayifeyek cinan in. Ewana, ji zewicandina in-

tînin? Naxêr. Tasîr û bandûra van gotinêñ wiha çilo li gelê kurd bûye, em iro bi tevekî li ber çavan temaşe dikin. Mirov, gotina ku ji devê xwe derdixîne difikire, dihezire. Wextê mirov tiştekî bibêje lazim e ku taliya wê gotinê bîne ber çavan. Lazim e ku însan hezar caran bifikirin û carekê bibêjin. Evanan bi giştî zirarêñ ku ji dûrketina ola îslamê pêşve hatine. Ji ber îsyankirina li hember Xwedê

tiya rejîma Komara Tirk pêş ve têt. Heftê sal zêdetir e ku ev rejîm li ser zordarî û kole-dariyê hatiye avakirin û bi destûrên kêfxwazî, zordarî û kufrbazî têt idarekirin, di vê rewşê de wê çawa ev pirs-girêk çareser bibe? Helbet gellek zor e. Lewra vê rejîmê heta niha ji bilî zilm, şkence, tevkujî û koçberkirinê tişteknekiriye û heqek nedaye nas-kirin. Tim ji bo kurdan xwîn û hêstirêن çavan rewa dîtiye. Binêrin, Teqrîrî Sikûn, qanûnên Dêrsim'ê, qanûnên mecbûrkirinên îskanê, Teoriya Ziman'ê Roj'ê, Destûra Rewşa Fewqelade û pêkaniya wê û her wekî evanan, destûr û qanûn derxistine. Hewtanê dijminî nevîna kurdan bêhtir kiriye li hember rejîmê wekê din ti xêr û kerek ji van des-tûrêن hovîn Komara Tirk ha-sil nebûne.

Di vê eviya vekirî û eşkere bête zanîn ku hetanê ev rejîm neyê guhertin, an nehilweşe kurd rehet nabin û ruyê re-hetiyyê jî nabînin.

"Zalimên xwînxwar nêzîk de bê wê bi şoreşek çawa bêtin qulipandin, wê bibî-nin." Bi vê ayetê û bi ayeta "Em dixwazin lutfê li mustedefan bikin û wan bikin warisê zemînê Xwedê." ji me re hêviyek mezin e û spartgehek e. Ev gotina Hz. Eli jî divêt bête qeydkirin: "Roja ku mazlûman werin berheu û zaliman sernixûn bixînin, wê ji rojên zaliman zilm dikirin, herî çetîn û dij-war be."

Em wan rojan ji Rebbê xwe dixwazin û hêvidarin ku her babetê zilman ji ser hemû gelên bindest û binketiyên cî-hanê rabe. •

# ZIMAN, AYETA XWEDÊ YE

MUHAMMED EMİN

Bismillahirrehmanirrehîm

Selama Xwedê li ser hemû mislimanen hişyar be û Xwedê yên di xewa xefletê de bin jî hişyar bike.

Geli xwendevanen kovara Nûbihar a delal,

Ez ê ji we xwendevanen delal re meselakê ku li welatê me derbas bûye binivîsim. Ez dixwazim ku hun jî li ser vê meselê hinekî bisekinin û bifikirin û parekê ji xwe re jê derxin.

Sala 1980'ê de mudîrek hat mekteba me. Wî mudîrî digot: "Ez misliman im û ji kurmancî hez dikim û dixwazim ku ev zilm ji ser kurdan rabe." Me jî gelekî ji wî zilamî hez dikir û me hemû sirên xwe jê re digot. Wexta ihtiîlala 12 ilonê çêbû ev zilama tam zîvirî û bû dijminê kurdan.

Di pê ihtiîlala leşkerên tîrkan de, rojekî li hewşa mekteba me, ez bi hevalekî re bi kurmancî diştexilîm. Min mudîr nedîbû, hema wî ez dîbûm. Hat ba min û ji min re got: "Çima tu bi kurmancî diştexili?" Min got welleh min tu nedîbû, mîrza mudîr." Wî li min da û got: "Temam min tu nedî û te jî ez nedîm, ma qey Xwedê jî tu nedît? Tu yê roja qiyametê çito hesab bide?" Ez li ser vê peyvê fikirîm û min got: "Ma gelo qey kurmancî li cem Xwedê jî yasax e?" û ez giriyan.

Ez çûm mal, min ev mesela ji bavê xwe re got. Bavê min ji min re got: "Ev mudîra ne misliman e. Ziman, aye-ta Xwedê ye û wî serbest kirye. Kî tiştê ku Xwedê serbest kirye men bike û çêkirina Xwedê înakir bike, ew kafir e."

Min wê çaxê nuh famkir ku kî bêje ez misliman im û nimêj bike û rojiyê jî bigre ew bi vana tenê nabe misliman. Ji bo meriv bibe misliman gelek qistas lazim e. Ji ber vê jî gereke meriv diqat bike.

Ev mudîrê me anha li derekê ye û serdarya hinek mislimanen dike. Xwedê wan mislimanen hişyar bike û bê li pey kê diherin, rê wan bide. •

VİDEOKASÉTÊN SEMPOZYOMA ME YA

PIRSA KURDÎ ÇAWA ÇARESER DIBE?  
Sê Kasêt

Ji Navnişana Nûbihar Bixwazin

# ÎSLAM NE STÛXWARÎ YE

MUSTAFA KARAGÖZ

Berî her tiştî ez dixwazim mana kelîma îslamê bidim.

Koka kelîma îslamê ji teslimbûnê têt. Yanê stûxwarkirina li ber hêz û qewetek bê dawî.

Yanê wextê ku yek ji xwe re dibêje "ez bûm misliman" yan ji "ez misliman im", bi vê peyîva xwe dixwaze vî tiştî bibêje: Ya Rebbî, yê ku terbiye dike Tu yî, yê ku rizqan dide Tu yî, yê ku ihtiyacêne me dide Tu yî, yê ku qanûnan li ser ebdan nazil kiryê Tu yî. Ez van tiştana hemûkan dipejirînim."

Îcar xuşk û birayên min, ez dixwazim carek din ji vê mesela teslimiyetê bidim ber çavan. Ka em çiqas teslim bûne? Gelek mirov belkî dibêjin ma hê em ê çiqas teslim bibin? Me welatê xwe teslim kir, me ola xwe teslim kir, tevî ala xwe ka ci di desten me de maye?

Ez vê teslimiyetê qest nakim, vê teslimiyetê de reziltî heye. Lewra ev teslimiyet ji ebdan re ye. Lîbelê teslimbûna Rebbê Alemê şeref û mîrxaşî û alîkariya mazlûman e, şerefa sef-girtina li hember neyarêni dijwar yêni mîna koramaran e.

Geli xuşk û bira, em carek din ji bifikirin, ka em çiqasî ji emrê Xweda yê xwe re dibêjin: "Me bihist û me itaat kir"? Baş li xwe binérin û li xwe vegeerin. Zimanê me dibêje "me itaat kir", lîbelê hal û karê me dibêje "eseyna". Îsyankirin ji bona zîlm û zora Fir'ewnî, emperyalistiya Emerîqanî û her cur rezaleten kermalîstiyê ye.

Di vê meselê de em kê ji xwe re mîhenk bigirin? Em çav bavêjin qernê eshabên Pêxember... Berya misliman bibin, li ser gerdûnê îsyankarên mîna wan belkî nehatibûn dîtin. Lîbelê piştî ku îman anîn, li hember Xwedê ji wan stûxwartir nebûne. Sehaba bi van herdu xesleten xwe, bûn mamoste. Gelê ereb artêşa Bîzans û farsan û roman bi binxistin û bi vî hawî xwe gihadîn meqsedâ xwe.

Ax ax, wê ci bibûya, pêşî nefsa min, dû re wî gelê mazlûm guhdariya vê gotinê bikraya. Hun zanin ew ê ci çêbûbûya? Ma ci cênedibû? Ma senemê reşo nedihat şikandin? Ma kafirê misqof ne dihat qewirandin? Ma xwîna mazlûman nedihat sekinandin? Ma ci nedibû? •

# JI WE XEBAT JI ME ARÎKARÎ

ABDULLAH DILBIRÎN

Birayên delal, hevalên hêja, xebatkarên kovara Nûbihar.

Silava Xweda yê bi merhamet û arîkarîxwaz li ser we û dilxwaz û misliman û welatparêzan be.

Ji hejmara ewil ve ez kovara Nûbihar dixwînim. Vê xebata we ya serbilind, serfiraz, xweş û bi rûmet, ji bo hemû misliman û gelê kurd û Kurdistanê ez pîroz dikim.

Ji bo van xebatên xweş di ber gelê kurd de, ji we xebat û sebat, ji me ji arîkarî û dilxwazî divêt.

Çiqasî ber bi pêş de dere, gelê kurd Nûbiharê nas dike û lê xwedî derdikeve û hîn ji wê lê xwedî derkeve.

Her hebin, gelek spas. •

# EZ NÛBIHAR BI NIGEHNDARÎ TAQÎB DIKIM

M.SALÎH AKGÜL

Birayên eziz,

Ez û malîyên xwe û hinek cîranên me, em xizmeta we tebrîk û pîroz dikin. Lewra ku heq e û ji bona gelê kurd gelek lazim e. Ji hejmara pêşî ve heta vêga ez Nûbihar bi nigehdarî taqîb dikim. Exlebê naverokên wê dixwinim. Hema gişt tevdé ji xîreta îslamî û welatparêziya mirov zêde dikin û hissiyata mirov difürinîn.

Nexasim, çawa birayê me Mistefayê Memîti di hejmara dehemîn de ji beyan kiriye ku ji pirtûkên Bediuzzeman em hêvidarin ku bêne weşandin. Lewra ew hem rêber e ji bo dawê û hem ji di nav exlebê mislimanan de ji alim û zana û têkoşerên vî zemanî tewr pêştir û bilindit e. Ü nexasim ji bo me kurdên bindest û bêkes re bûye kesek û xwediye kî mîrxaş û serfiraz. •

# FERHENGOK

<b>A</b>	olmak	<b>M</b>	Qor: Sıra
<b>Afirandox:</b> Yaratıcı, yaratıcı	<b>Dorhêl:</b> Etraf, çevre	<b>Maf:</b> Hak	<b>R</b>
<b>Alemeğisti:</b> Evrensel	<b>Dûvik:</b> Kuyruk	<b>Menfûr:</b> Kendisinden nefret edilen, içrenç	<b>Ragihandin:</b> İletişim
<b>Amade:</b> Hazır, amade	<b>E:</b>	<b>Mêrg:</b> Çayır, otlak	<b>Raman:</b> Düşünce
<b>Aram:</b> Sükün, huzur	<b>Evîn:</b> Aşk, sevgi	<b>Mero:</b> "Be adam" anlamında bir deyim	<b>S</b>
<b>Araste:</b> Süslü	<b>Ex:</b> Kardeş	<b>Mêtîngér:</b> Sömürgeci, emici	<b>Salixdan:</b> Izah etmek
<b>Aşîr:</b> Süt kabı, içine süt konulan kab	<b>Fena:</b> Gibi, aynısı	<b>Mewc:</b> Dalga	<b>Saman:</b> Sağlık, servet, mülk
<b>Aşîti:</b> Barış	<b>Fûrin:</b> Taşmak, fokurdayarak kaynamak	<b>Mixabin:</b> Yazık ki	<b>Sazûman:</b> Kurum, kuruuluş
<b>B</b>	<b>G:</b>	<b>Miyand:</b> Arada	<b>Seg:</b> Köpek, it
<b>Babet:</b> Konu, cins, mü-naset	<b>Gedeno!:</b> Çocuklar!	<b>Mizawir:</b> Afacan, yaramaz	<b>Sentezkar:</b> Sentezci
<b>Balîf:</b> Yastık	<b>Genî:</b> Kötü koku, kokusmuş	<b>N</b>	<b>Serfiraz:</b> Başarılı, muzaffer
<b>Bazargan:</b> Tüccar, tacir	<b>Gerdengalind:</b> Ensesi kalın	<b>Naverok:</b> Fıhrist, indeks	<b>Serpêhatî:</b> Macera
<b>Behre:</b> Pay, hisse	<b>Gèle:</b> Karınca	<b>Navnasî:</b> Kimlik	<b>Serrastkirin:</b> Düzeltmek, tashih etmek
<b>Bendewar:</b> Gönülden bağlı	<b>Guldan:</b> Vazo	<b>Neteweperist:</b> Milliyetçi, ulusalçı	<b>Serwer:</b> Egemen, hakim
<b>Berhem:</b> Eser, yaratıcı, hasılat, gelir	<b>H:</b>	<b>Nifir:</b> Beddua	<b>Serxwebûn:</b> Bağımsız olmak
<b>Berxwedan:</b> Direnme	<b>Hedan:</b> Şüphe	<b>Nigehdarî:</b> Gözleyicilik, koruyuculuk	<b>Sîtayış:</b> Hamd, şükür
<b>Berz:</b> Yüce	<b>Hêlin:</b> Yuva, kuş yuvası	<b>Niştiman:</b> Vatan	<b>S</b>
<b>Bijin:</b> İştahı çekmek, imrenmek	<b>Hevspartîn:</b> Birbirine dayanmak,	<b>Nola:</b> Gibi	<b>Şal:</b> Pantolon, bir cins kumaş
<b>Binyad:</b> Temel, esas	<b>Hilberandin:</b> Üretmek	<b>Nûciwan:</b> Yeniyetme	<b>Şax:</b> Dal
<b>Bizav:</b> Canlı, hareketli	<b>Hizir:</b> Düşünce	<b>Nûjen:</b> Modern	<b>Şerpeze:</b> Sefil, kötü durum
<b>Borandin:</b> Geçirmek, aflatmek	<b>Hol:</b> Meydan	<b>P</b>	<b>Şilo:</b> Bulanık
<b>C</b>	<b>Hov:</b> Kaba, vahşi, gör-güsüz	<b>Panorama:</b> Ufuk, görüşlü	<b>Şîn:</b> Yas
<b>Calib:</b> İlgi çekici, calip	<b>J:</b>	<b>Paşeroj:</b> Mazi, geçmiş	<b>Şîrove:</b> Yorum
<b>Celeb:</b> Çeşit, nitelik, tür	<b>Jîndar:</b> Canlı	<b>Pejirandin:</b> Kabul etmek, tercih etmek	<b>Şoreş:</b> Devrim
<b>Ceribandin:</b> Deneme	<b>K:</b>	<b>Peyman:</b> Antlaşma, ahit	<b>Şoreşvan:</b> Devrimci
<b>Ciwân:</b> Genç	<b>Kambax:</b> Mutsuz, bozuk, berbat	<b>Pênûs:</b> Kalem	<b>T</b>
<b>Ç</b>	<b>Kamil:</b> Olgun, erişkin	<b>Pêşdeçûyi:</b> İlerlemiş, gelişmiş	<b>Taybetî:</b> Özellik
<b>Çalak:</b> Çevik, aktif, faal	<b>Kargeh:</b> İşyeri	<b>Pêşeng:</b> Öncü	<b>Tebat:</b> Sabır, tahammül, durma
<b>Çapemenî:</b> Basım-yâym	<b>Kab:</b> Aşk kemiği	<b>Pêşverû:</b> İlerici	<b>Temen:</b> Yaş, ömür
<b>Çareser:</b> İmkân, halletme	<b>Karpêk:</b> Eser, yapıt	<b>Pêwendî:</b> İlgi, alaka	<b>Tevger:</b> Davranış
<b>Çepelane:</b> Kırlice	<b>Keftar:</b> Sırtlan	<b>Pêxoş:</b> Olmasını hoş karşılamak, olmasını arzulamak	<b>Tevkuji:</b> Katliam
<b>Çepel:</b> Kirli, ahlaksız	<b>Kêrbaz:</b> İşe yaramak, hakkından gelmek	<b>Pijîn:</b> Pişmek	<b>Tewş:</b> Denge
<b>Çerx:</b> Çark	<b>Keremkar:</b> Kerem eden	<b>Piling:</b> Kaplan	<b>Têkilîn:</b> Karışmak
<b>Çîn:</b> Nakış	<b>Keşti:</b> Gemi	<b>Pindepîr:</b> Örümcek	<b>V</b>
<b>D</b>	<b>Kîso:</b> Kaplumbağa	<b>Pispôr:</b> Uzman, bilirkişi	<b>Vezîn:</b> Esnek, tolerans
<b>Dad:</b> Adalet	<b>Kinc:</b> Elbise	<b>Pîrejin:</b> İhtiyan kadın	<b>W</b>
<b>Dadvan:</b> Adil	<b>Korfam:</b> Kitgörüşlü, dargörüşlü	<b>Pîremêr:</b> İhtiyan adam	<b>Wîsal:</b> Kavuşma
<b>Dehl:</b> Ağaçlık, bağ	<b>Kotek:</b> Kötek, daya	<b>Pîroz:</b> Kutlu, muzaffer	<b>X</b>
<b>Dexes:</b> Kışkaç	<b>Kovan:</b> Hüzün, üzüntü, keder	<b>Pîsesaz:</b> Sanayici	<b>Xedar:</b> Gaddar
<b>Digel:</b> Bununla beraber, ... ile	<b>Kudik:</b> Yırtıcı hayvan yavruları, enik	<b>Ponijîn:</b> Düşünmek, dalmak	<b>Xerbzedé:</b> Batı tarafından çarpılmış
<b>Dijwartîr:</b> Daha şiddetli, daha beter.	<b>Kulm:</b> Yumruk	<b>Q</b>	<b>Xeyirandin:</b> Değişmek
<b>Dildar:</b> Maşuk, sevilen	<b>Kurtan:</b> Semer, eyer	<b>Qad:</b> Meydan, alan, yer	<b>Xubar:</b> Toz, kül
<b>Dillerzan:</b> Gönül titreten	<b>L</b>	<b>Qedexe:</b> Yasak	<b>Xwelî:</b> Kül
<b>Dilxwaz:</b> İyimser, istekli	<b>Leheng:</b> Kahraman	<b>Qels:</b> Zayıf, güçsüz	<b>Z</b>
<b>Dirb:</b> Şekil, benzer	<b>Likumandin:</b> Sendelemek	<b>Qirêj:</b> Pis, pislik, kirli	<b>Zîl:</b> Topraktan yeni çıkmış bitki ucu
<b>Divêt:</b> Gerekmek, elzem	<b>Liv:</b> Hareket	<b>Qîrf:</b> Alay, şaka	<b>Zimanê zîkmakî:</b> Ana dili
	<b>Lok:</b> Erkek deve		<b>Zinar:</b> Kaya, kaya parçası •

# KITÊBÊN EM BELAV DIKIN

## (DAĞITIMINI YAPTIĞIMIZ KİTAPLAR)

### Kitêbên kurdî (Kürtçe kitaplar)

• Rîsala Biratiyê (Uhuvvet Risalesi) .....	20.000
• Rîsala Biratiyê (Bi tîpên erebî) .....	20.000
• Peyiva Bîst û Sêyemîn (23. Söz) .....	20.000
• Peyivêن Piçûk (Küçük Sözler) .....	30.000
• Nimêj Dikim / Komisyon (Kuşe) .....	40.000
• Nimêj Dikim / Komisyon (Spi) .....	35.000
• Dîwan / Mele Ehmed Cizîrî .....	70.000
• Doza Jin / Hiseyn Elî Başar .....	20.000
• Ferheng (kurdi-tirkî, tirkî-kurdi) / D. Izoli .....	195.000
• Ferheng (zazaki-tirkî) / Malmisanij .....	100.000
• Mamoste Seîd Norsî (Soranî, bi tîpên erebî) .....	40.000
• Mewlûd / Mele Ehmed Bateyî .....	35.000
• Nalînê Min / M. Şakir Koçer .....	15.000
• Nûbar / Ehmed Xanî .....	25.000
• Baran / A.Qadir Botan .....	10.000

### Kitêbên tirkî (Türkçe kitaplar)

• Bediüzzaman'ın Hayatı / Abdurrahman Nursi .....	25.000
• Şırnak Baskını / Osman Resulân .....	30.000
• Aydınlık ve Dindarlık / Abdulkerim Suruç (Çev. Sabah Kara) .....	20.000
• Ayet Yorumları / Ali Şeriatî (Çev. Sabah Kara) .....	30.000
• Dini Düşüncenin Yeniden Kurulması / A. Kerim Suruç (Çev. Sabah Kara) .....	20.000
• İllerici Gericilik / Abdulkerim Suruç (Çev. Abdullah Kutlu) .....	15.000
• Peygamberler Aydınların Önderleri / A. Kerim Suruç (Çev. Abdullah Kutlu) .....	20.000
• Zamanın Zeynebi / Zeyneb Burucerdi (Çev. Zafer Fırat) .....	20.000

### Kitêbên erebî (Arapça kitaplar)

• Lemalar (el-Leme'at) .....	120.000
• Mektubat (el-Mektûbat) .....	120.000
• Sözler (el-Kelîmat) .....	140.000

**Kitêbên li jor, bi hundir, bi bîst ji sedî (20 %) erzanî; lê bi derve, bêerzanî têne şandin. Yêñ ku hun dixwazin, bihaya wan hesab bikin, ji mecmûa bihayê, 20 % kêm bikin, baqiyê li hesabê jêrê razînin û fotokopiyeke pela razandinê, bi mektûba xwe ya ku we navê kitêban têde nivisandiye, bişînin navnîşana kovara me. Mesrefa postê li me ye.**

(Yukarıdaki kitaplar yurt içine % 20 indirimle, yurt dışına ise indirimsiz gönderilir. İstediğiniz tutarını hesaplayın, toplamdan % 20 düşün, geriye kalan tutarı aşağıdaki hesaba yatırın ve alındı belgesinin fotokopisini, istediğiniz kitapların isimlerini ihtiva eden mektupla birlikte dergimizin adresine gönderin. Posta masrafı bize aittir.)

### JIMAREYÊN HESABÊ (HESAP NUMARALARI):

**Li hundir** (Yurt içi): Postgiro (Posta Çekî): Süleyman Çevik, 658265

**Li derve** (Yurt dışı): Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100-3118770

### NAVNIŞAN (ADRES):

**Nûbihar**, Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3, Fatih / İstanbul

Tel: 533 75 88 Faks: 524 00 38

